


Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan :

## Çareserî dê pêşerojê

# bide qezenckirin



✓ Ji vir û pê de ezê li ser afirandina pêvajoya aştî û biratiyê bisekinim. Ji bo çareseriye gavavêtina PKK'ê ne tawîz e. Divê raya giştî bê amadekirin. Gotinên Serokê Dadgeha Qanûna Bingehîn riya çareseriyeke demokratîk nîşan didin. PKK'ê xwe li hemû dinyayê birêk xistin kiriye, heke çareserî çenebe PKK dikare vî şerî bi salan bidomîne.

(Nûçe: R.3)

## Di warê çand û wêjeyê de rola jinê

→ Ger jina kurd, van hestêne xwe yên bi nixû û ewqas jî bi rûmet bîne ser zimên, an bi stranan an bi helbestan an jî li ser kaxizê, wê berhemê bêhempa derkevin holê.

(R. 10)

Li Tîmora Rojhilat kontra guh nadîn peymanê

Referandûma serxwebûnê hate taloqkirin



→ Li gorî peymana ku hatibû girêdan, diviyabû di 8'ê gelawêjê de 400 hezar hilbijêren tîmorî biçûna ser sandoqan. Lê, hêzên Endonezyayê û hevkaren wê nahêlin ku gelê Tîmora Rojhilat daxwaza xwe ya bo serxwebûnê bîne cih.

(Rûpel:11)

Nebahat Altıok li ser rewşenbîrên tîrk û Kêşeya Kurd axîm:

## Rewşenbîr bi meseleyê bas zanîn, lê dengê xwe nakîn

✓ Rewşenbîrên tîrk, ji zû de ye, bi Doza Kurd baş dizanîn, lê çavêن xwe ji vê rastiyê re digirin. Rewşenbîrên ku berê rastiya kurdan dîtiye, wan iro xwe sparxiye şovenîzmê. Berê helbestvanan bêtirs peyva Kurdistan bikar dianî. Ew ji tîrsa nikarin helbêstên xwe yên ku di salên 60 û 70'yî de nivisîne, iro bidin çapkirin.

(HEVPEYVÎN: 8-9)




Gelo ez li tatîlê ci bikim?

Dersa herî xwes  
îstik û çîrok e

→ Netirse! Carna ji dibistanê bireve û bi kîfa xwe bigere. Gava mamosteyan li te xist, li ber rabe û bêje "Ez te nas nakim. Ma ev der qereqol e!" Ji her kesî re bêje, dengê xwe bigihîne heft qatêne ezmên...!

(R. 12)

Azadiya WELAT



E-Mail:s.berbang@usa.net

SAMİ TAN

Dîtinê şêwîkarêne dewleta tirk, serdanpê li dijî zanistê ne. Ew bêyî ku li mercan bifikirin ferma zimanê kurdî radikin; ji tesbîteke zimanzanî encameke siyasî derdixin.

**H**in mirov bi awayekî zanistî hin xebatan dikin, lê mixabin pişti demekê li kirina xwe poşman dibin. Lewre tiştê ku kesen zanyar dozandine, di destê hinekên 'xérnexwaz' de dibin destik û pêlîstok. Xebata zanyarê japonî Prof. Gouici Kujima jî di destê kêmzanayen tirk de bûye tiştekî bi vî rengî. Danasina xebata Kojima pêşî di Azadiya Welat de derket. Bi alîkariya dostekî me yî japonî haya me ji vê xebatê çêbû û di rûpela 13'yan hejmara 126'an a Azadiya Welat de danasina wê hate kiran.

Prof. Kojima dixwaze li ser zimanen ku li Tirkiyeyê pê têne peyivîn tezekê amade bike û pêşkêşî zanîgehê bike. Wê demê peywirdarêne dewleta tirk vê teza wî wekî bombekekê bi nav dikin û zorê didinê ku ew dev jê berde. Dema ew vê yekê napejirîne, îcar dixwazin ku ew bibêje, zimanê kurdî bi kêtî perwerdehiyê nayê, lê ew vê yekê jî napejirîne, li ser vê yekê rê li ber xebata wî

digirin.

Îro kesen ku wê demê peywirdarêne dewletê bûne, malnişin bûne û li ser havê nişkariyê şewirmendiya dewletê dikin û navê wî ji bo armaca xwe bi karîn. Pêşî Gündüz Aktan dest avet vî karî, van demen dawîn jî kevnebalyoz Şükrû Elekdağ dest bi heman çirokê kiriye. Şükrû Elekdağ jî wekî Gündüz Aktan, li aliye kî dixwaze ku nasnameya kurden bê pejirandin, li aliye din jî wisa dike ku mirov bibêje, tiştekî ku mirov wekî taybetmendiya kurden bipejirîne li holê nîn e.

Dema mirov bala xwe dide gotinê şêwîkarêne dewleta tirk, mirov leqayî dînîn serdanpê li dijî zanistê ne tê. Lewre ew bêyî ku li mercen civakî u siyasî bifikirin ferma zimanê kurdî radikin; ji tesbîteke zimanziyê encameke siyasî derdixin. Dema Prof. Kojima gotibe, "Min Kovara Hêviyê ya Înstituya Kurdî ya Parîse ji kurden Dêrsimê re xwend, tiştek jî fêm nekirin" ew tesbîteke zimanziyê

dike, kes nikare ji vê gotinê encameke politik derxe, lewre ew çêli mercen civakî u siyasî yên ku bûne sedema vê yekê nake. Lî 'kurdîzan' ên ku hê nizanin navê zaravayen kurdî binivîsin, radibin ji tesbîteke zimanziyê encameke siyasî derdixin. Tiştê ku dewleta tirk dike gotina 'Hem diz e, hem topiz e' tîne bîra mirov. Wê pêşî bi zilm û zorê rî li ber standartbûn û pêşketina zimanê kurdî girtiye, ew di nava dîwarêne malê de hepis kiriye, piştre jî şêwîkarêne wê dibêjin 'cîma zimanekî hevgirtî yê kurden nîn e, nexwe kurd tunin.' Kêmzaneyen navborî qet naxwazin fêm bikin ku ziman jî bi pêşketina civakê re bi pêş dikeve û bi hevnamesbûna kesen ku pê dipeyivin re standart dibe. Lî em dikarin bibêjin ku Prof. Kojima îro were lêkolînê bike, dê bigihêje encamén cuda, lewre têkoşîna 15 salan gelek tişt guhartine, lê zilma ku ji dewleta tirk bibîne dê neguhere.

# Öcalan ji dewletê re ferma xwend

## Ferhengok

DR. FETHİ ABDULFETTAH

**P**işti mij û morana şerê herêma Balkan meseleya Serokê kurden Abdullah Öcalan û darizandina wî ya ku li Tirkiyeyê didome dîsa kete rîza yekem a rojeva navneteweyî. Dewleta tirk belkî jî xwest di nava vê mij û moranê de Abdullah Öcalan bidarizîne û dawî li Kêseya Kurd bine. Lî, niha berî ku biryarekê bide, divê bi şarezayî bifikiye.

Öcalan di destpêka vê dagheha dîrokî de hin daxuyanî dan û ji bo ku Kêseya Kurd di navbera dewletê û partiya wî de bi awayekî aştiyane çareser bibe, pêşniyaza hevkariyê kir. Gelek kes li ser vê yekê rawestiyen.

Kesinan ev helwesta Öcalan wekî ji doza xwe avarêbûn û hewldana ji bo xwe ji darvekirin filitandinê nirxand û diyar kir ku wî dîroka xwe serdanpê fedâ kiriye. Hin kes jî dibêjin Abdullah Öcalan beramberî çewisandinê psikolojik û fizikî maye û mîjîyê wî hatiye avadan. Tirk di warê işkenceyê, peydakirina amûr û rebazên işkenceyê de jêhatî û navdar in. Neteweyen ku rojekê jî beramberî kîrinê bi vî rengî yên Osmanîyan mane, vê yekê baş dizanin.

Hem kesen Öcalan bi tirsonekî û tes-

limbûnê tawanbar kiriye û hem jî kesen ku dewleta tirk bi hovîtiyê tawanbar kiriye, hinekî bi lezgînî tevgeriyane û ji ber şiroveyen hestiyar wan têkiliya vî Serokî û doza wî ji hev qut kiriye. Di rûdanen wiha de tirs û işkence tiştîn nepêkan nîn in. Her wiha rayedarêne tirk ev rewş wekî têkçûna vî Serokî û doza wî nîşan da. Lî, rûdanen li dadgehê ji nû ve xwendin û sererastkirina daxuyaniyê Öcalan ji me dixwaze. Hingê emê tê bigihêjîn ku ev yek ji her du şiroveyan jî cuda ye û di daxuyaniyê Öcalan de têkildariyeke lihevkirî ya siyasî heye, heta helwesta wî li dijî hikûmeta tirk navtêdan e. Li aliye din PKK'ê piştevaniya tevaya pêşniyazên Öcalan kir.

Edî mesele darvekirin an jî darvenekirina Öcalan nîn e. Kêseya Kurd di warê navneteweyî de bi dilxwazî tê pêşwazîkirin, lewre jî ji bo çareserkirina wê li ber hikûmeta tirk bûye ezmûnek. Di sala 1993'yan de serokomarê Tirkîyeyê yê berê Turgut Özal ji bo ku kurdi li Tirkîyeyê bibe zimanê duyemîn bang kiribû, heta ji wê wêdetir diyar kiribû ku ji bo ku kurdi bin banê dewletê de bibin xwedî birêveberiyeke otonom, ji bo lihevruñiştinê amade ye. Lî, artêşa ku li welêt hîn jî desthilatdar e ev yek red kir, got daxwazîn bi vî rengî ji bo avakirina dewletêke serbixwe ya kurden gava ye-

kemîn e.

Ji roja ku Öcalan ji aliye rîexistinê istîxbaratê yên Amerika û İsrailê ve hatiye girtin vir de Kêseya Kurd di rojeva cîhanê de ye. Ew pozbilindî û sermestiya destpêkê ya generalen tirk îro edî bi qasî berê nemaye. Berî dadgehê ji bo ku esîre kurd beramberî çewisandinan nemîne û cezayê bidarvekirinê lê neyê birîn, ji gelik herêmîn cîhanê şiyarkirinê tund hatin. Hin serokên welaten Yekîtiya Ewrûpayê ji bo Kêseya Kurd sazkirina konferanseke navneteweyî pêşniyaz dikan. Her wiha Neteweyen Yekbûyî diyar kir ku wekî prensip bo sazkirina konferanseke wiha amade ye. Çapemeniya tirk niha baştir dizane ku ji bo ewlehî, aramî û pêşketina civaka tirk di çarçoveya yekîtiya dewletê de bo kurden otonomî û çareseriyeke aştiyane pir girîng e.

Li ser vê bingehê, bo çareseriyeke aştiyane li dadgehê banga Öcalan a hevkariyê girîngirin dibe. Ev yek ji ber tirsê, qelsiyê û ji dozê avarêbûnê naqwime, ji pêjinkariya wî ya li hemberî gelê kurd û tirk diqewime. Ev, ji bo rizgarkirina rewiyên keştiya ku li bagerê qelibye, "xeleka rizgariyê" ya qewîn û di dema xwe de hatiye çekirin e.

Evinîs ji Rojnameya misirî ya bi navê Alem El Youm hatiye girtin.

bandor: karîgerî	pejirandin:
(etki)	qeblûkirin
bîhistyar: dil-	pelandin: yok-
tenik (hassas)	lamâ
çejdar: tamdar	pergal: sistem
dubendî: ikilik,	pêşbazî:
itilaf	pêşbirk
erdîngarî:	(yânişma)
cografya	rewa: meşrû
erjeng: tırsnak	rewşenbirî: ron-
(korkunç)	akbîr (aydin)
fûrîn: taşmak	rêzenîvis: yazı
helbestvan: şâîr	dizisi
helwest: tavır	rêzik: misra,
hesan: bileme	dize
taşı	rojnívîk: gün-
hevjin: eş,	lük
yaşamdaş	sosret: ecêb
hevkeş: denge	sareza: pispor,
jêderk: çavkanî	zana
karîger: etkin,	veguhêzin:
faal	neqlkirin
kendav: körfez	vesuştin:
keşû: gemi	kuru-
kulek: rojin	lama
(baca)	vezanîn:
pejinkar:	têderxistin,
duyarlı	texmîn
	zor: pir, gelek

AZADIYA WELAT  
ROJNAMEYA HEFTYEY  
(Haftaîk Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN  
Yonetim Yeri:  
İstiklal cad. Aşmalı Mescit sok. 35/37  
No:308  
Beyoğlu/Istanbul

TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13  
FAX: 251 95 85

Girineneyê Gişî yê Weşanê

(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMI TAN

Berpîse Karên Nîvîsaran

(Yaz İşleri Müdürü)

M. SALIH TAŞKESEN

ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

Yayın Koordinasyon:  
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

BELAVKIRIN

BİRYA DAGITIM

NİVİŞGEHİN TEKİLİYÊ

(İritbat büroları)

Amed:

Tel: 0 (412) 223 34 83

Izmir

Tel: 0 (232) 446 19 50

Mîrsin  
Tel: 0 (324) 233 83 96

Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

Nûnerê Gişî yê Ewrûpayê

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

Swîse:

Necmi Aksoy

Tel: 41 76 372 41 18

Almanya:

Fener Rojbiyani

Tel: 49 228 92 51 284

Sweden:

Şöres Reşî

Tel: 46 86 52 34 29

Fransa:

M. Ali Doğan

Tel: 33 60 88 63 161

Belçika

I. Can

Tel: 32 53 64 12 41

Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

Suriye:

Jana Seyda

Helim Yusiv

*erokê Giştî yê PKK'ê Öcalan :*

# areserî dê pêşerojê bide qezenckirin

vê serhildana civakî, ya ku berî niha dehan caran mafêñ wê yê çandî û siyasi hatine qebûlkirin, lê tu carî ketiye jiyanê, ji saziya herî payeberz dewletê bigirin heta kesen nezan û ji zê hemû jî berpirs in. Divê ev yek bê in û her kes berpirsiyariya xwe bi cih bîne.

erokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, di parastina xwe ya dawîn de, dîsa doza rawestandinâ ser kir zanîn ku çaresernekirina Kêşeya, wê Tirkiyeyê hem ji aliye aborî ji aliye siyasi ve tengav bike. Öcalan kir ku ger aşıyeke demokratik were, dê pêşerojê bide qezenc kirin; a wê ser dijwartir bibe.

i danişna heftemin ya Doza Sedsa-Serokê Rûmetî yê KNK'ê û Serokê yê PKK'ê Abdullah Öcalan ragi ku ger ev ser çewt bê nirxandin û terora sexesî bê binavkirin, wê encaçewt bêne standin û wê alozî dijir bike. Öcalan, di parastina xwe de ûna Bingehîn ya Komara Tirk rexne û wiha dibêje: "Li Tirkiyeyê nerazî a civakî ya salen 1970'yî, bi derber 12'ê adara 1971'ê û 12'yê rezbera 0'yî eşkere bû. Pişti Qanûna Bingehîn 27'ê gulanê, ku bi mudaxeleya erî re hatibû, di sala 1982'yan de bi erandina Qanûna Bingehîn ya antiokratik hemû partiyen siyasi (çepgir, gir û muxalefet) neqanûni hatin hesilin û peyre ji hatin darizandin."

i aliye din Öcalan, da zanîn ku PKK wê demê de derketiye holê û bi girevgera xwe li gorî rastiya civaka, bi propaganda, lêkolîn û lêgerînê kiriye. Wî, diyar kir ku avabûna û neqanûni ye, lê meşrû ye. Serokê yê parastina xwe wiha didomîne: "Bi eti qedexeya li ser ziman, ku bi qasa 1982'yan pêk hat, li hemberî ala zordar, digel neqanûnbûyîna ildenê, divê meşrûbûna wê li berin bê girtin. Paşverûtsi, jixwesermkitira li ser gelê kurd, divê baş bê dî-Karekterê anarşik yê pêvajoyê û dike ku mercen têkoşîna qanûni tu in de, pêk hatina serhildaneke bi vî yî divê kesî şaswaz neke. PKK'ê ji stiye vê yekê bîne ser xeteke strateji ideolojîk."

erokê PKK'ê Öcalan di xweparastina de, idfanameya ku der barê wî de bû amadekirin û nirxandina çapemeye û her wiha ya dewletê bi şêweyekî dixne dike û wiha dibêje: "Dibêjin 30 hezar kesî, kujerê zarokan" nêziktayîn, nêziktedayîneke bêin-

saf, bêedalet û ji rasîtiye dûr e. Ez vê yekê

napejîrim. Red dikim. A rastîn, bi awa-yekî rewa û meşrû, ji bo jiyanekî baş, ku têr fedekarî ye, her wiha têkoşîna me bo komar û civakeke hîn demokratir e. Di vî şerî de dema ku berpirsiyariya herdu aliyan bê dîtin, wê encameke dadyane we-re hilgirtin. Ez yek ji berpirsên sereke me, lê ne takene berpirs im. Di vê serhildana civakî, ya ku berî niha bi dehan caran mafêñ wê yê çandî û siyasi hatine pejirandin, lê tu carî pêk nehatiye, ji saziya herî payeberz ya dewletê bigirin heta kesayetiyeñ nezan û bêwîjdan jî berpirs in. Divê ev yek bê dîtin û her kes berpirsiyariya xwe bi cih bîne.

## PKK wê bikaribe şer bi-domîne

Öcalan wekî din balê dikşîne ser hêza PKK'ê û dibêje, PKK'ê li çar aliye cîhanê xwe birêxistin kiriye, lewre wê bikaribe ligel Artêşa Tirk şer bike. Öcalan di vî warî de ji wiha got: "Wê ser bidome. Ji her aliye ve PKK wê bikaribe şerekî di asta navîn de bidomîne. PKK'ê xwe li hemû dînyayê birêkxistin kiriye. Tecrûbe, piştgiriya lojîstîk, mewziyîn ku hatîne bidestxistin, derfetên peydakirina pê-wîstiyen aborî û şervanan, dema bi erdînîgariyeke guncaw ve bê yekirin, PKK dikare vî şerî bi salan bidomîne. Di qada navnetewî de li hemberî Tirkîyeyê itîfaqîn dewletan, dê zêdetir bîbin. Domandina şer, ji aliye aborî, siyasi û civakî ve wê Tirkîyeyê tengavtir bike. Di warê çandî û perwerdehiyê de, dê paşketin pêk were. Her wiha li hemberî demokratikbûna Tirkîyeyê, şer dê bibe astenga herî mezin."

## Çareseriya demokratik tê ci wateyê?

Serokê PKK'ê di parastina xwe de li ser rola PKK'ê ya bo aşıtye û destketinênu ku wê bi aşıtye peyda bin jî, radiweste û berdewam dike: "Derfetên PKK'ê yên leşkerî, hem li hundir hem jî li derive, wê bo çareseriye bikevin xizmeta Tirkîyeyê. Tirkîye dê karibe xwe baştır biparêze.



Kurd, ku bi komareke demokratik re bibin yek, wê ji aliye leşkerî ve jî, berevajî hêza dijber, wê bibin çavkaniya hêza stratejîk. Ev yek jî, dê pêşeroja Tirkîyeyê ji alozî û xetereyê rizgar bike. Bi pergala demokratik, Tirkîye dê xwe ji tengasiyê rizgar bike; wê leçûmîn aborî û manewî bide rawestandin; di warê pêşketina aborî de, gavê mezîn dê bêne avêtin. Bi vê yekê, wê civaka feodal ji hev bipelişê; çareseriya Kêşeya Kurd dê ji aliye siyasi ve korebîni û tengbîniyê ji holê rake.

Bi awayekî giştî, di demokratikbûna avahiya siyasi de, dê rola misteyê hilgire. Siyaset wê nebe navgîna rantê, dê bibe saziyeke afîrîner û birûmet; dê problema bi Yekîtiya Ewrûpîye re çareser bibe. Bi taybetî dostaniya kurdan a herêmî, wê piştgiriyeke mezîn bide hêza herêmî. Rista kurdan a li Rojhilata Navîn, wê bibe bingeha mafdarî û hêzbûnê. Alozî û tengasî, wê bi xwe re têkçûnîn mezîn bîne, lê çareseri wê bibe sedema qezencen mezin."

## Pêvajoya îmraliyê dikare bibe destpêkeke dîrokî

Öcalan, di beşa dawîn a parêznameya xwe de, bi kurtasî, li ser çareseriye wiha dibêje: "Ez bawer im, ev şer û dawiya vê serhildanê, wê pêşeroja pergala demokratik a civakî dabîn (garantî) bike. Heta ku problemen civakî neyîn çareserkirin, eş û jan dê bidomin. Sedemîn girîng yên serhildanê civakî hene. Serhildana dawîn, a ku serkêsiya wê PKK dike, divê bi dawî bibe. Ev pêwîstiyek e. Ji vir û pê de ez dê li ser afirandina pêvajoya aşti û bîratiyê bisekinim. Ji bo çareseriye gavavîtina PKK'ê ne tawîz e. Divê raya giştî bê amadekirin. Gotinê Serokê Dadgeha Qanûna Bingehîn riya çareseriyeke demokratik, ku mafêñ çandî jî di nav de cih digirin, nişan dide. Ev yek, pêdiviya şaristaniya demokratik û hemdem e. Ger ez li gorî xala 125'an a Qanûna Bingehîn bême cezakirin jî ez dê li pêşberî dîrokî ji aliye siyasi û exlaqî ve mafdar bêm dîtin."

NAVENDA NÜÇEYAN

## Kurtenûce

Ensarioğlu: Êrîş roj bi roj zêdetir dîbin

Li gorî daxuyaniyeke Serokê Mazlum-Derê Yılmaz Ensarioğlu ku roja 21'ê pûşperê hatiye belavkirin, 19'ê meha pûşperê, polîsan bi biryara DGM'ê, bi ser navenda giştî ya MAZLUM-DER û şaxen wê de girtiye. Di wê bi ser-girtinê de gelek wêne û nivîs ji aliye polîsan ve hatine desteserkirin. Ensarioğlu di daxuyaniye érişen li ser wan şermezar kiriye û diyar kiriye ku dewletê êrîşê xwe yên li dijî saziyên sivil dijwartir kirine. Wî, daye zanîn ku ew ji ser baweriya xwe peya nabin û ewê doza mafparêzîyê bikin. Her wiha wî got, "Ger dozê li me bikin, em dê gelekî pê kêfxwêş bibin; ji ber ku dê kêmâsî û neqanûniya li ser mafparêzan bê dîtin."

## HADEP: Divê realîteya kurdan bê nasîn

21'ê meha pûşperê ji aliye HADEP'ê ve der barê Doza Öcalan de, ji bo raya giştî, daxuyaniyeke çapemeniyê hate ragihandin. Di daxuyaniya ku li ser navê Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê A. Hîdr Doğan hatiye ragihandin de, ji bo çareseriye û girîngîya pêvajoyê 8 pêşniyaz hatine kîrin. Di pêşniyarnameyê de tê gotin ku divê agirbesta 1'ê rezberê di bin berpirsiyariyekê de bê domandin. Her wiha digel ilankirina efûyê, divê êrîşen çekdarî ji bêne rawestandin. Li aliye din di pêşniyaznameyê de tê xwestin ku PKK di nava sistêma demokratik de, bo qanûnbûyîn xwe amade bike. Wekî din tê xwestin ku digel efûyê, aşıyeke civakî, bîrafî û hwd. di bin banê xeteke siyasi de pêk were.

## F.Gülen hêvî bi avê de birin

Berî niha bi hefteyekê der barê Serokê Cemaeta Nurciyan Fettullah Gülen de kaseteke videoyê hate weşandin. Bi weşandinâ kaseteke re Tirkîye rabû ser piyan. Li gorî kasete ku pêşin ji aliye ATV'ê ve hate weşandin, Gülen dixwaze milk û idareya dewletê bixe bin kontrola xwe, bi vê yekê jî wê dewletê ji her aliye ve bi endamên cemaeta xwe ve dagire û şoreşke İslâmî pêk bîne. Di banda ku hate weşandin de tiştekî wisa derbas nabe. Lî di rapora ku ji aliye artêse ve hatiye amadekirin de Fettullah Gülen wekî xeternaktîn mirov tê binavkirin. Li ser rewşa Gülen ne Serokomar Süleyman Demirel ne jî Serokwezîr B. Ecevit daxuyaniyeke serwextkar dan. Li gorî rapora artêse di salê de 60 trîyon hatina cemaeta Gülen heye.

*Nakokiya di navbera Ewrûpa û NATO'ye de bi êrîse diyar d*

# 'Kuleka keştiyê xuya kir'



Rêzenivîs

2

Ewrûpaya ku ji ber sosyalîzmî îradeya xwe bi giranî teslimî NATO'ye kiriye, êdî li pey peydakirina "Ewlehi û Nasnameya Parastin" ye. Ji vir pê de bingeha stratejîk a NATO'ye ji hin aliyan ve ber bi pûçbûnê ve diçe. Gelo pêvajoya pêsiya me dê di mijara ji nû ve parvekirina cîhanê de nasnameyeke çawa bide NATO'ye? Hevkêseyen nû yên cîhanê dê bersiva vê yekê bidin.

## Ezmûna Balkanan a NATO'ye

Çapemeniya Rojava li ser biserketin û têkçûna şerê herêma Balkan gengeşîyan dike. Diyar e ku encama provaya şerê herêma Balkanan dê mîna şerê Kendavê nîn be. NATO û Amerîkayê ji şerê Kendavê bi quretiya "serkeftin" ekê derketin û fatûra ya lêçûnên şer wan bi hêsanî daye ber Erebistana Sûûdi û Kûveytê. Niha li holê ne serkeftin heye ne jî welatekî xwedî petrol ku karibe mesrefen lêçûnên şer bide... Ev şer ji aliye leşkerî ve hatibe qezencikirin ji ji aliye psîkolojîk û civakî ve hatiye windakirin. Bi pey çapemeniya Rojava, NATO'ye ji bo rîlibergirtina "komkujiyê" "li ser navê mirovahiyê" mudaxeleyi Yûgoslavayê kiriye. Dema ku mirov bala xwe di de; li ser destpêka şerê Yûgoslavayê û pêvajoya 92'yan vir de, tê digihêje ku ev dereweke bêbinî ye. Bi piştgiriya rasterast a Almanyayê û bi ya nerasterast a Ewrûpayê pêsiyê Hirvatan dest bi qirkirinê kî. Ji Almanyayê werê tê ku dê Hirwatistan û Slovenyayê bixe bin bandora xwe û kîşeyê çareser bike. Lî diyar e ku ji 92'yan vir de ev kîşeyê çareser nebûye. Çima Rojava li sirban hate xezebê? Wekî diyar e Sîrbistan li diji "Pergala Cîhanê ya Nû" asteng e. Piştî hilweşîna sosyalîzmî Ewrûpayâ Rojava, serdanpê kete bin bandora Rojava. Bi sedan salan e herêma Balkan tim li deriveyi Rojava ma; nebû rojavayı. Divê ev devera "hov" û "asê" êdî li gorî rez û rîçikîn Rojava bîhata sazkinin. Lî belê, Miloseviç li diji vê asteng e. Di pêvajoya ku Yekîtiya Ewrûpayê û NATO li

NATO'ya ku li dijî Pakta Warşovê ava bû, bi êrîşen xwe yên dawîn hêdî hêdî bi rewşa paktê ya berî niha bi deh salan ve diçe. Nakokiya di navbera NATO'ye de roj bi roj xwe eşkeretir dike. Her du refîn NATO'ye yên ku yek Amerîka û yek jî Ewrûpa serkêsiya wan dike di warê stratejîk de li hev nakin. Bi vê yekê jî reng nasnameya NATO'ye û cîhana global kêm hindik diyar dibe.

Ewrûpaya Rojhilat ketine hewldana kârîgerbûnê de ev asteng iro nîn be sibê her wiha bi piştgiriya Rûsyayê, dibû ku li dijî pêşketinê bibûya asteng. Muda-xaleya li dijî Bosna-Hersekê zû encam dabû, ji wan tirê evê jî zû encam bide. Amerîkayê bi taktikên şareza arnawût li dijî sirban kîşîsand û mudaxaleya NATO'ye rewa kir. Ev êrîş di demeke ku Rûsyâ qels e de li dar xist. Li gorî feraseta "Pergala Nû ya Cîhanê" ji bo bîdestxistina Ewrûpaya Rojava û Balkanan divê ev asteng ji holê rabûya. Amerîkayê kîliya ku bi awayekî rasterê dest bi mudaxaleyê kir, nakokî kûr kîrin. Hevdîtinê ku li ser otonomiya

qas niha zû be jî, mirov dikare ji Şerê Balkanan ê NATO'ye encaminan derxe: 1- Berî her tiştî efsaneyê ku bi riya teknîkê û balafirênu ku xuya nabin hatine afirandin pûc derketin. Bi ser de jî van "çekîn biaqîl" gelek xeta kîrin. 2- NATO'ya ku tenê bi bombebarandina hewayî xwe sinor kir, nekete bejî û bereya xwe ya stratejîk teng kir, berî ku dest bi şer bike, kete "sermestiya serkeftin" ê. 3- Provaya şer a li herêma Balkan di dema hewldanê berfireh-bûnê yên NATO'ye de rû da. Di encamê de dê bandora NATO'ye bi giranî kêm bike. 4- Şer dubendiya li navenda NATO'ye berbiçavtir kir. Di

demdemî niyeta împeryalîzmî vespî Ma NATO'ye hetanî niha ji bo rizgî kîya kîjan gelî alîkarî kiriye? Ji 92'yan vir de li herêma Balkan 300 hazar lî qîr bû. NATO'ya ku leşkerekî xwe da nake, dê di nava wê dojehê de miyahî çawa biparêze? NATO bi vê rewê, di rastiyê de pêsiya xwe dixitîne. Şerî li Balkanan bi hemû nîşaney xwe, dide der ku ev derew dê demî dirêj nedome. Împeryalîzma ku miyahî ajotîye na, du şerîn cîhanê, pişri daye dîktotariyê leşkerî, di şerî herêmî de bûye sedema mirina bi nîşan kesan û li ser axa xwe hev nîşan mirovahiyê ji holê rakirîye, çawa mirovahiyê biparêze? Ev yî jî sermestî û xapandine.

## Li Balkanan duben diya Amerîka û Ewrûpayê

Hêzên ku di parvekirina cîha de xwedî bandorin dê pêşeroja NATO'ye diyar bikin. Bi taybetî têkoşîna parvekirinê ya di navbera Amerîka û Ewrûpayê de dê diye kar be. Piştî hilweşîna sosyalîzmî Amerîkayê bi Şerê Kendavê şerdestiya xwe saz kir. Lî, bi dirêjî ya demê re şerdestiya navborî qîbû. İro li ser sê herêman bi awayekî berbiçav ji nû ve parvekirin pête; Rojhilata Navîn, Kafkasya Ewrûpaya Rojhilat. Ji wan Ewrûpaya Rojhilat û Kafkasya bi hilwîşîna sosyalîzmî re ketin warê jî ve parkirinê.

Amerîkayê bi Şerê Kendavê re Rojhilata Navîn şerdestiyeye teqî ava kir. Ev yek ne tenê li dijî Rûsyayê her wiha li dijî Almanya û Japonyayê bire seri. Berî Şerê Kendavê Almanya û Japonyayê xwest ku xwe bigîhîn jêderkîn petrola Iran û Iraqê. Bi devletên navborî re peymanin girêdan. I piştî şer hemû peyman betal bûn, Amerîkayê hema bêje başebaş li ser van perolan şerdestiya xwe çêkir. Lî, ev şerdestî di van deh salên dawîn de hêdî qels bû. Bi taybetî Almanya Fransa ketin hewldana meşandina politikayê serbixwe. Ewrûpaya dixwaze devera Iran, Iraq û Sûriyeyê, ku li di Amerîkayê ye, politikayê bimeşîne. (Dê bidom)



Kosovayê dihatin kîrin, ji nişka ve bi kîşîsandina Amerîkayê veguheziya serxwebûnê. Bi gurbûna berxwedana sirban re mudaxale zêdetir derkete pêş. Berpîrsê Mafêni Mirovan ê Neteweyê Yekgirtî Jîri Dienstbeir wiha dibêje: "Her kes tawanbar e. Arnawûdan piştî mirina Tîto di salên 89'an de sirp çewi-sandin. Peyre Miloseviç hat û got, 'Tu kes nikare we bihingêve.' Li dû vê hengê bûyer roj bi roj gur bûn. "Niha xezeba şîdetê em rapêçandine. Bi tenê em têkçûna di vî şerî de bipejîrinin, em dikarin ji vê gêjgerînekê bifilitin. Lewre me metodên çewt bi kar anîn."

NATO'ya dêwasa li dijî 'Sîrbistana biçûk' tu encam bi dest nexist. Her çi-

navbera welatên Ewrûpayê de di warê hedef, asta şer û nêzîktedayina li dijî şerê bejî de her dem nakokîyan rû da. Eger şer dirêj bibe, xesar zêde bibin nakokîyan navxweyî yên di bin banê NATO'ye de dê kûrtir bibin. Di encamê de; di navbera mebest û encama şer de dijberiyê mezîn hene. NATO'ya ku dibêje: "Ez li ser navê mirovahiyê tevdîgerim" xesareke mezîn da her du gelan. Bi milyonan mirov beramberî rûdanêner erjeng man, lî, ev "leheng" ên mafêni mirovan bo ku leşkeren wan nemirin, li bilindahiyan bombeyan direşînin û di encama xetayêne mezîn de bûne sedema mirina gelek mirovan. Ev derewa mezîn, dibe ku bi awayekî

# Makîneyê fotokopiyê

CIHAN ROJ

her destê ku bi pênuşê digire man-qê serdestan vedişê ser kaxizan. m bûne deyndarên denydaran. Gö-tê nivîsin bi kîjan zimanî hatibe fidin ji wî zimanî bo kurdî hatîye wer-din. Ne ji dil be jî ta gelê kurd bi-e azadiyê wê ev rewşa kambax bido-Lê gere ne evqas bûya. Elbet qedera vî zimanî jî wekî qede-geli ye; ji pênc hêlan ve (hêla pênce-jî Rojava ye) êrîş têr ser, disa jî xwe-reze.

Gere em ne wek makîneyê fotoko-(makîneyê jibergir) bin. Heke bin-ji kurdî be û lêkolîn bê kirin, dê bê-ku hemwateya gelek têgîh û peyvîn-jî di zimanê kurdî de heye.

i hêla azîneyê ve du pêşniyaz: Ta ji îngilîzî, tirkî, frensî, erekbi... têr wergerandin, gere li peyvîn kur-ku derbasî zimanê din bûne û li zi-farisî û zaravayê kurdî bê nihîrîn. Divê peyvîn bi kurdî ên ku di-n servekirî de li ber mirinê ne bêñ bi-nîn. Hinan ji wan wateya xwe winda-ye. Li gorî rézimanê gengaz e ku wa-k din bistînin.

Xeletiyek jî der barê devokan de ye. niya peyan wekî peyvîn devokî têr bandin, ji ber vê nayêñ bikaranin. Ew-seyvîn devokî ne. Bikaranîna peyvan-hêla gramerê ve tiştîn devokî derdi-n.

**Mînak:****Serhed** **Botan****Hîv** **heyy****Hêşîn** **şîn****Di mal da** **di mal de****Ji min ra** **ji min re**

Hinek mirov bêyi ku li binyada pevya ku bi kar tînin binerîn, li ser devoka xwe serhişkiyê dikin. Bo nimûne, pevya "bêvil" bi şirebî ye, "poz" peyveke bi kurdî ye. Lê piraniya nivîskarén ji hêla Botan bi rik pevya "bêvil" bi kar tînin. Anglo xwerûkirina zimanê kurdî ji kesî re nebû derd û kul.

**Çend peyvîn pêwîst û dahûrandina wan**

**Pizben:** Benê dirêj.**Mînak:**

"Şivan pizben li mil rapêça û ber bi-palê ve meşîya."

Li ser pevya piz mînakeke din; "Bes e tu dixwî, ma hûr û pizûrê te quâl bûye?"

**Dahûrandin:****a)** piz pêşgir e**b)** pizûr ji du hêmanan pêk hatîye; piz û hûr

**c)** pêşgira /piz-/ wateya girs, dirêj li peyvî bar dike.

**Encam:****Pizûr:** mîde**Tor:** acemî**Mînak:**

"Ax lê Weso lê lê lê Wesilayê way way Cenî tor e, lê lê lê naçe avê way way"

Kezî: kas

**Mînak:**

"Parçeyek goşte nerme nişanî cîrana xwe da û got: 'Giş kezî ye, goşt pir hindik e.'

**Den:** boyax**Mînak:**

"Ji bo çi te kincen rengin avêtin ava-keli, den daye."

Askor: Ma mirov nikare askor di wa-teya "varoş" de bi kar bîne? Tê ditin ku ev pevya ji zû ve di kurdî de heye.

**Mînak:**

Zarokekî mizawir e, ji sikak û askoran dernayê.

/a-/ pêşgirek e, di zaravayê kirdkî (dimîkî) tê bikaranîn û wateyeke neyinî di-de pevya. Ev pêşgir dişibe pêşgira /a-/ ya di zimanê îngilîzî de; wekî pêşgira di-pevya "apolitic" de.

**Mînak:****Dimîlî/kirdkî kurmancî****Ağanî** ne candar

Gelek peyvîn ku bi heman pêşgirê ha-tine afîrandin hene.

**Trîşma:** Ev pevya cihê "giz" a tirkî di-gire û her wiha jî bi wateya "bandora ve-sarı" jî tê bikaranin.

**Mînak:**

"Bük bi çav de hatibû; kil léda, trîşma xwe winda kir."

Ji bo peyvîn ku ji zimanê kurdî derba-sî zimanê din bûne jî mirov dikare wekî mînak pevya "berî" bide. Ev pevya di zi-manê Osmanî de di cihê "karasala" tirkî de tê bikaranîn. /r/ya di vê peyvî de stûr e.

## Biwêj û şayesê kurdî

- Mere kûçik dide xatirê xwedîye wî: Dema yekî sûcek kiribe, giregirên gund efûkirina wî bi wan gotinan dixwazin.

- Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe ve tê dale-qandin: Her koyun kendi bacagîndan asîlir.

- Mewîja reş di qirikê re xuya dike: Ji bo pesndayina bedewiya keçikan tê bikaranîn. Bi taybetî di çîrokê gelêrî de mirov pir rastî vê şayesê tê.

- Mirî ne melûn be, gor lê teng nabe: Dema yekî/ê guneh nekiribe tiştîn xerab nayêñ serê wî/wê.

- Ne ji ewanan be, wê gur û mih pev re biçerîn: Ji bo nîsandayina rola neyinî ya awanan hatîye gotin.

Pisik ne li ban e, mişk evdirehman (qeherman) e: Koyunun olmadığı yerde keçîye Abdurrahman Çelebi derler.

Newala xîrî xalî, rovî lê dibê walfî: Kesek tune, ev der bi te maye.

Ne kortika kerenga ye: Carek, dudo, sisê... (Çekirge bir ziplar iki ziplar ...)

Paç xistiye guhêñ xwe: xwe li kerîyê daniye

Perdeya rû qetiyaye: Perdeya şermê çirandiye

Qûtê nemir e: kitkanaat Rez baş bû, teyrok ji lê hat: berê gul bû, baranê lêxist şîl bû.

Paqreş di ser xwe re nedîtine: Kesi di ser xwe re nabîne.

Pûş xist eyarê wî/wê: dengê wî/wê birî. (ağzînim payını verdi)

Rûnê genî li ser nanê xwe xwedî ye: tiştî xerab li xwedîye xwe vedigere.

Rê ji dilan naçe dilan: mirov dikare bi gotin û kir-inîn xwe dilê mirovan xweş bike. A di dilê me mirov de kes pê nizane.

Rê li ber winda bûye: nizane ci bike.

Seyê ku rizqê wî qut dibe, cejna qurbanê xewa wî tê

Sipiye wî fetiqîne: Biti kanlanmış

Şanî dijmin bide û vekişîne: qelefetê wî çavtîrsî dike, lê ji bili wî bi kêri tiştîkî nayê.

Tu teyrî, ez xak im: Tu bi ku ve biçi, tu yê li min vegerî.


Yê sîrê nexwe bêhn jê nayê: ates olmayan yerden duman çıkmaz

Ji xelkê re dengbêj e, ji min re lal û gêj e: kûçikê me li ber deriyê xelkê direyê.

BRO OMERÎ

## Hêrişî tirkekan bo ser Kurdistan

R. HUSEYNÊ XELIQÎ



**S**alî 1254'î zayinî moxolekan hêrişyan kirde ser nawçey Rojhelati Nawerast. Ewan ne ke her sinûrî cografayî zor wilatiyan gorî, belkû le zor şwê de pênamey neteweyî netewekanî em nawçeyan gorî û pênamey gerîdeyî tirkî xoyan le cê dana. Emane wek bela, pelamarî şarî gundiyan deda, xapûriyan dekird û le kuştarî be komel xoyan nedeparast. Lew pêwendîye de seg û pişileşyan dekuşt. Mêjûnûsekan gotiyane: "Hatin, kuştiyan, sûtandiyan, girtiyan û birdiyan. Gewrepiyawan û zanakaniyan yan kuş yan le tîrsan zêdî xoyan be cê hişt. Kitêb û nûsrawekaniyan yan sûtand yan be ko xistiyan jêr gîl ta darizan."

Hulako serdarî moxol, şarî "Meraxey" hawkewşenî Kurdistanî kirde pêtext û Kurdistanî kawil kird. Em turke

hêrişkerane duwem deshelaftî Rom, wate Romî Rojhelatiyan ke êsta nawî xoyan "Turkiyeyan" le ser danawe û beşekî zor le xakî Kurdistanîşî weber girtiwe, dagîr kird. Binemaley Osman Beg lem moxolane be nawî xelîfey İslâm nêzîk 500 sal be zoremîl be ser çendîn wilatî rojhelat da desthelat-daretiyan kird. Lew mawe da, lew perî dirindeyî da bo gorînî ziman, kultur û pênameyî neteweyî netewejérdestekan têkoşan. Kurdistan û kurd le gişt ew netewe jérdestane ziyatir ziyanîyan pê kewt. Em beşey Kurdistan le salî 1514 zayinî da le şerî Çildêran de le nêwan Selîmî Osmanî û Smeîlî Sefewî da be resmî kewte ser xakî Turkiye nawdérki raw.

Diway Şerî Yekî Cîhanî tirkekan têkoşan gişt şwênewarî neteweyî kurd bisirînewe û le ew pêwendîye da le encamdanî hîş çeşnedirînneyî û cinayetek dirêxiyan nekird. Le pêş da guşar le ser gişt netewejérdestkan deslehatî Osmanî bû, belam le benawdesthelatî Komarî Tirk da, guşarî bêbezeyane û faşîstane xiraye ser netewey Kurd. Hemû şitekî kurdîyan

yasax kird, nawî şar û gundiyan guherî. Wuşey kurdî le qamûşî tîrkan da sî-rayewe. Axawtin be kurdî ne ke her qedexe kira, belkû bo kurd bira be tawanekî gewre. Nûser û şâîr û ron-akbîrî kurd, wek dewrey Osmanîyekan kewtine bendîxane û eşkence kiran, yan perîwey henderan bûn, yan berhemekaniyan be zimanî tirkî bilawki-rawe. Bêcge lewe hezaran gundiyan kawil kird û gişt şwênewarî konî netewekaniyan ramalî. Êsta le kotayî sedey bîstemîş da rast doxî wek heyş sedepêşir le ara da ye. Kuştinî rolekanî kurd û sûtandinî Kurdistan be rewa le qelem dedin û azadîxwazanî kurd be terorist nawdér dekin. Bo sirînewey gişt pênamey neteweyîman le pişîwanî zil-hêzkanî cîhanîş kelk werdegrin. Le ber çaw bîr û ray giştî xelkî cîhanewe serkirdey kurd dedizîn û bi dirindanetirîn şêwe reftarî legel dekin. Belam kes mitiqî pêwe nayêt û sat û sewday siyâşî û bazirganî legel mîratgiranî Cengîz Xan û Hulako da êstaş her berdewam e. Emeş wek pelahewrekî cilkin û pir le şüreyî, be nawçawanî baregay mañî mirovewi diyar e.

## Şehadeteke dilsoj û daxbar:

# A. Rahman Gezer

Pişfî ku Serokê Giştî yê PKK'ê tê girtin, ew û çend hevalên wî, xwe digihînin nav refen şervanên azadiyê. Hîn Hevalê Ganî nû cilê şervantiyê li xwe dike; bi tenê çekên parastinê di destê wî û hevalê wî de ne. Di vê rewşê de navbera wan û dijmin de şerek radibe. Di vî şerî de Hevalê Ganî, 7 guleyan di bedenê xwe de vedişêre.

**A**RHMAN GEZER (Ganî), di sâla 1981'ê de li Sêrtê ji dayikê dibe. Ew, ji malbateke welat-parêz tê. Rewşa aborî ya malbatê ne baş bû; ew xizan û hejar bû. Wî, dibistana seretayî li Sêrtê qedandîye, a navîn jî ji ber zilm û zora dijmin terikandiye. Hevalê Ganî di zarokatiya xwe de gelekî perişanî û tadehiyê dibîne.

Dema dewleta tirk, dest bi şewitandina gundan dike, malbata wî jî, ji bêgaviyê, di sala 1994'an de koçî navçeya Edeneyê Ceyhanê dike. Ji ber ku destmiza xebatkaran li Ceyhanê kêm e, ew û bîrayê xwe berê xwe didin Stenbolê. Hevalê Ganî li vê derê bi Partiyê re hevnas dibe û pê re têkiliyê datîne; li ser koçberriya gelê kurd û tarûmarkirina Kurdistânê disekine.

Di vê navberê de Hevalê Ganî dil dike ku gelek tiştan bike, lê rewşa malbat û bavê wî rî li ber vê yekê digire. Lewre bavê wî bi nexweşîyeke giran dikeve û hewcedariya pereyan rû dide. Zarokên hûr di nava malê de gelek bûn, lewma destê wî ji wan qut nedibû û nedîçû nav refen şervanan.

Hevalê Ganî hevalakî mirovperwer û dilovan bû; hez ji her kesî dikir û di ciyatê de cih girtibû, xwedî gotin û ştexelî bû. Wî, her tim rî nîşanî hevalê xwe dida. Kêfa wî qet ji mirovên tiral û bêkêr re nedihat. Dixwest her kes wekî pêşeng û serkêşekî/ê, xwedan vîn û bawerî be û li dijî zordarî û stemkariyê serê xwe netewîne.

Hevalê Ganî bengî û dilozê mûzik û govenda kurdî bû. Li ku derê xêleke kurdî hebûye xwe digihandê û direqisî. Ew ne mirovîkî jirêzê bû; dilgerm û



Malbata A. Rahman Gezer, ji ber zordariya dewleta tirk berê xwe dide Tırkiyeyê. Ew, hem debara malbata xwe dike hem jî ji bo têkoşînê xebatê dike.

pêjînkar bû. Wî, dil hebû her roj bixne, bi pêş bikeve û tiştên ku hînbûy derdora xwe re vebêje. Lewre her pirtûk û kovar li ba wî peyda dibûn, gel vê yekê, bi awayekî giştî, xwe ji sîra feodalîzm û paşverûtiyê şûştabû, caran nehişt xwişkên wî kincê wî bi an jî xwarina wî çêbikin.


Piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê girtin, hew debara Hevalê Ganî tê, le re ew û çend hevalên wî, xwe digihî nav refen şervanên azadiyê. Hîn Hev Ganî nû cilê şervantiyê li xwe dike, tenê çekên parastinê di destê wî û hev wî de ne. Di vê rewşê de di navbera û dijmin de şerek diqewime. Di vî de Hevalê Ganî, 7 guleyan di bed xwe de vedişêre. Li pey vî şerî, les termê wî tînîn nava Osmaniyyê. R 2'yê adarê malbata wî, xêberê şehad wî hiltîne û berê xwe dide Osmaniyyê, ew pê nahesin ku Hevalê Ganî ji al leşkeran ve hatiye şehîdkirin.

Di vê navberê de cenazeyê wî dîziyareta ku miriyan lê dişon. Li vê d meleyê ku miriyan dişo, dibîne 4 gule ûrê wî de, 2 di milê wî de û yek jî di niya wî de ye.

Roja Cejna Qurbanê ya yeken malbat û hevalên wî tev diçin ser gî wî. Ew pêşîn sirûda neteweyî dixwî peyre jî gora wî bi qurnefîl û kulîlkî xemilînîn.

Berî ku Hevalê Ganî biçe nav re xwişka wî jê dipirse, "Gava dijmin, dîl girtî û got bipeyive, te ci bikî?" Ev wisa lê vedigerîne: "Ez dê bêjîmî, xeynî Serok Apo kes nikare min bide xaftin!"

ZÎNDAN EVÎND



Mehmet Yıldız (Cuma)  
17.11.1998– Nûrheq

... Xwezgîniyê azadiya te bû,  
gulek ji gulên zîndanê,  
Pêtek bû ji agirê Mezlûman,  
pelek bû ji pirtûkên berxwedanê.  
De bes e Nûrheq  
De bes e Engizek.  
Bi hérsa xwe vemirîne agirê Napalmê  
Biparêze Sebriyê dayika min.  
Biparêze hevalan.  
Biparêze siwarén azadiyê.  
Bes Nûrheq  
Bes e...!

(H. Sefqan)

Welatparêzên Albistanê



Erdal Çeken

Hevalê Erdal Çeken roja 13'yê ser maweza sala 1998'an ji bo Serok Apo agi bi bedena xwe xist û bi giranî birîndar bû. Ji Girtîgeha Mêrdînê ya tîpa E'yê hilda Nexweşxaneya Amedê. Hevalê Erdal a roja yekê berfanbara 1998'an de tevlî nav kerwanen şehîdan bû.

Em di şexsê Hevalê Erdal Çeken de ser xwe ji bo şehîdên me yênen nemir ditewînîn heya dilopa xwîna xwe ya dawîn jî emê û bin fermana wan de bimeşin!..

Li ser navê dîlên şer ên doza PKK'ê yênen girtîgeha Mêrdînê  
Seydo Danış,  
Ramazan Kaya, Mecit Yalim

LI NÇM ya ïzni  
● 26.06.1999 şemî

Roja Xwarinê Kurd a Kevneşopî ya 33'yan  
Konsera Koma Rewşen  
saet: 17:00  
● 27.06.1999 yekşem  
Konsera Koma Rewşen  
saet: 17:00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



LI HADEP'a Esenler

● 26.06.1999 şemî

Konsera Koma Rojhilat, saet: 17:00

LI HADEP'a Ümraniye

● 27.06.1999 yekşem, Konsera Koma Gulen Xerzan, saet: 15:00


LI YÇKM'8

● 26.06.1999 şemî

Film: AX, Derhêner: Kazım Öz, saet: 17:00

## ÇAVDÊRÎ

Lihevhatin!



SERKAN BRÜSK

**E**z di guhê kuştinê de evîna jiyanê dixwînim. Hêviya xwe dixwazim di dilê wê de zindû bikim. Ez jiyana xwe ya li nav şînâhiya ku li ser sînga Mezopotamya şîn hatîye, bi dilsozî lê bi bazara jiyaneye wekhev, pêşkêşî vê kuştinê dikim, ku ji min re, ji Çin û Maçîn wekî diyariyeke xelayê maye. Heta ez gotinê xwe neqedînim, ezê devê xwe ji guhê wê derneyînim.

Ew jî, bi sebir û aramiyeke, ku tenê li wê dixwe, li min guhdarî dike. Serê xwe mîna ziyâyê binê dojehî dihejîne. Ez nema zanim; ne bi mebesta erêkirinê ye, ne jî, bi mebesta ji holê rakirinê ye.

Min berê xwe ji evîna çiyan guhartibû ber bayê deştan ketibûm.

Serê Cûdî, Herekol û Agirî di bin piyên min de herifibûn. Min şopêneynûkên xwe di zinaran de hiştibû. Dengê navtêdanê xwe di gelîyan de bi dengvedana zingîniya teqînê vejînê re, ji belavbûnê re hiştibû.

Destê min pêşî ji berstûka çiyan hate qutkirin. Dûvre jî, gewdeyê min firiya. Ez bi ber bayê nedîyariyê ketim. Warêni li serdemâ nûjeniyê, ez bi soza mîrê çê ji rî birim, ez bi durûtiyeke keysbazî, ji bêbextiyê re hatim hiştin. Parzemînan ez ranedigirtim. Di wan hilnedihatim. Parzemînen parvekirî êdî di bin piyên min de dihejîjîn. Di bin giraniya min de noq dibûn. Taftiyê xwe berdida ser her deverê. Min nema pêşîya xwe didit. Bi destpelînkê min riya xwe vedikir. Ez ketibûm labîrenta reş a nûjeniyê. Dîwarêni ji bêxtiyê lêkirî ez di nava xwe de bê tevger û bê nefes dikirim.

Min bedenê xwe bi yek derbê re dan ber êgir. Ez bûm peykeren ji êgir û li hemû kolanen humanîzmê bi şevan, bi rojan geriyam. Bûm dirûşme û hewar, di devê sedhezar de, li binê zikê banê cîhanê teqiyam.

Min bi bedenê xwe germ kirin meydan û kolanen rojava.

Tevî vê jî, ez hatim heliqandin. Van bêbextan ku, bexten xwe li sük û bazarêni ku li wan kirîn û firotina gelan pêk tê, ez di nava destê xwe de kirim gogeke ji êgir û ez ji hevdu re avêtim. Ez hatim avêtin.

Min xwe nema dîtibû. Dema min çavên xwe vekiribûn, min xwe di nava hebûnen rûtenî de dîtibû. Dema deka xwe gerandibû. Ez hatibûm heliqandin ser serên wan girêni ku bi serên jêkirî yên mîna komirê hatibûn lêkirin. Ew girêni, ku bi destê mijokdarên rojavayî di dema lêgerîna aqût û mircanan de, ji hestiyen hebûnen ji qîrê hatibûn lêkirin, di nava şevekê de axa xwe ya bêber û bêkêr, ji bin piyên min kışandibû. Heta min xwe dabû hevdu mirin rûyê xwe nîşanî min dabû.

Min destê xwe pelandibû lê reha dara xurmê bi destê min ve hatibû. Bagera tozê ku kaniya wî ji rojhilat bû, ez mîna pelê dara pîroz li ber xwe biribûm. Ez li hewa firandibûm. Ez li ber ecacokê ketibûm...

Ez di guhê kuştinê de peymana jiyanê diqîrim. Yasayen xweristê dixwazim serobino bikim. Dixwazim mirin û jiyanê li hev bînim!


NÇM ji Mehabadê ta Başûrê Bicûk jî li benda berheman e:

# Pêşbaziya Çîrok û Helbestan

Xebatê Navenda Çanda Mezopotamya Beşa Sînemayê (NÇM) bi dorfirêhî didomin. Ji beşen NÇM'ê Kovara Jiyana Rewşen û Beşa Sînemayê pêşbaziya helbest û çirokan da destpêkirin. Wekî tê zanîn beşa sînemayê ev xebata xwe ya pêşbaziya çirokan kiriye kevneşopî û ev çend sal in didomîne. Lê Kovara Jiyana Rewşen yekemîn car e xebateke wiha dide destpêkirin û wekî wan di da-xuyaniya xwe de diyar kiriye, hewl didin xwe ku ew jî wekî beşa sînemayê vê xebata xwe bikin xebateke dûvedirêj û kevneşopî.

## Pêşbaziya Çîrok û bo Filman

Wekî tê zanîn di salêن derbasbûyi de Beşa Sînemayê ya NÇM'ê çirokan ku ji bo pêşbaziye hatibûn şandin, wekî projeya bo filman dinirxand, lê îsal ev xebata xwe hinekî din berbiçavtir kir û ev pêşbazi wekî "Pêşbaziya Çirokan a bo Filman" bi nav



Ceyê. Îsal ew diyar diken ku wê çirokên wisa ku naveroka wan baş be û bo filman guncawtir bin jî di dereceyê de di ber çavan re derbas bikin.

## Yekemîn pêşbaziya helbestan

Li bakurê Kurdistanê yekemîn pêşbaziya helbestan, îsal ji aliye Kovara Jiyana Rewşen ve bi boneya bîranîna Elî Temel da destpêkirin. Di vî warê de xebatkarêni Jiyana Rewşen heta iro pêknehatina pêşbaziyeke bi vî awayî wekî kêmasiyekê dîtiye, lewre xebateke wisa daye destpêkirin. Dîsa li gorî baweriya wan, di van salên dawîn de pêşketina helbestnîvisinê jî lez daye wan ku xebateke wiha bikin.

Di pêşbaziye de xebatkarêni Jiyana Rewşen didin xuyakirin ku her çiqas ji bo dirêjahi-

ya helbestan pîvan tune be jî ger helbesten ku ji wan re bêne şandin, kin bin ji bo nirxandinê wê baştir bibe.

Di warê besdarbûna helbestan de ew hêvî diken ku wê ji Başûrê Bicûk ê Kurdistanê, Ji Mehabadê, ji dilê Kurdistan; Amedê, Mêrdînê û Ewrûpayê jî helbestvan tevlî pêşbaziye bibin. Dîsa ew hêvî diken ku wê di salên pêş de xebatêni bi vî awayî xurtir bikin û dê beşek ji nava helbesten ku îsal tevlî pêşbaziye dibin di hejmareke kovarê de, wekî dosyayeke taybet biwesînin.

## Mercen besdariyê

Wekî şertên pêşbaziye; di warê çirokê de her kes dikare tenê bi çirokekê ya bo filmê tevlî pêşbaziye bibe û di warê mijarê de jî serbest e. Zimanê çirokan divê tirkî û kurdi be û dirêjahiya çirokê jî divê bi rûpelên daktîloyê, ji 5 rûpelan derbas nebe. Her wiha kesen ku çirokê bişînîn, divê navê rûmûz bi kar bînîn û navê xwe yê rast, kurtejiyana xwe tevî navê xwe yê rûmûz bikin zerfek din û bo wan bişînîn.

Ji bo pêşbaziya helbestan jî heman tiş derbas dibin û tişten ji pêşbaziya çirokan cu-da jî ev in: Divê helbest teqez bi zimanê kurdi bin û her kes herî hindik bi du helbestan û herî zêde jî dikare bi çar helbestan tevlî pêşbaziye bibe. Her wiha endamên jûriya pêşbaziye wê di demen pêş de diyar bibin û kopyaya helbest û çirokan jî divê li gorî hejmara endamên jûriyê bêne şandin. Mêjuya serdana tevlîbûna pêşbaziye 20. 9.1999 e.

CEMİL ANDOK / STENBOL

# Nebahat Altıok li ser rewşenbîrê

## Rewşenbîr bi meselîyê bas z

**Rewşenbîrên tirk, ji zû de  
ye, bi Doza Kurd baş  
dizanin, lê ew îro çavê  
xwe ji vê rastiyê re digirin  
û xwe dispêrin şowenîzmê.**

Dema me da ser riya mala Nebahat Altıok Komkujiya Sêwazê di bîra me de bû. Gava em nêzî ber deriyê malê bûn, li ser tabelayekê “Ji bo bîranîna Metin Altıok” hatibû nivîsîn. Dema çavên me bi vê nivîsê ketin, bi yekcarî em çûne wan rojan. Beriya ku em bi Nebahat Altıok re dest bi hevpeyvînê bikin, li ser taştê, me pêşîn qala rewşa wê kir. Lî, wê gotina me birî û got, “Vê dawiyê rewşa Tirkîyeyê aloz e, gelo ji vê yekê wê çi derkeve? Diyar bû, kêm be jî, hinekî tenêtiyê ew tengezar kiribû; li malê, mase û pirtûkxane kirine hevalên xwe yên sohbetê. Li gelek dîwarên malê wêneyê wê û Metin Altıok hatine daleqandin. Bi taybetî pirtûkxaneyâ wê zor dewlemend e. Dema me dest bi hevpeyvînê kir, gelekî jixwebawer diaxivî, lê disa jî gotinê xwe hinekî dipîvan. Ji ber ku der barê wê de duşê doz hatine vekirin. Hevpeyivîna me li ser rewşenbîrên tirk, kurdan, politikayê dewletê û Komkujiya Sêwazê germ bû. Dîtinê yên li ser rewşenbîrên tirk hêjâyî nixandinê ne.

### Berê herkesî bêtirs peyva Kurdistanê bi kar dianî

Altıok, di serî de, bi şêweyekî dûvedirêj, qala rewşenbîrên tirk û helwesta wan a li ser Doza Kurdan kir. Wê got, berê helbestvanan bêtirs peyva Kurdistan bikar anîye; angó kêm be jî, misyo-neke siyasi li helbestan hatiye barkirin. Bi taybetî jî helbestvanen tirk ên ku di salên 1960 û 70'yi de çûne Kurdistanê û li wê derê xebitîne, ji herêmê gelekî bandor wergirtiye û li ser jiyanâ kurdan, bi taybetî jî, li ser rê û çiyayê kurdan gelek helbest nivîsîne. Altıokê wekî minak, ev rîzîken helbesta Turgut Uyar xwend: “Dera te kelem hil kiriye, ger tu bêjî qey Bihar e/ Li kurdistanê, li ser riya Mûş û Tatwanê wê xwîn jê biherike.” Lî peyre got, “îro, ew helbestvan, her yek li saziyeke dewletê, ji bo berjewendiyen xwe yên şexsî kar dikin. Ji ber vê yekê, ew ji tîrsa nikarin helbêstên xwe yên ku di salên 60 û 70'yi de nivîsîne, îro bidin çapkîrin. A rastir naxwazin ku berê dewletê bidin xwe.”

Altıokê, helwesta rewşenbîrên ku li hemberî serê Wîetnam û Filîstinê hel-



Hevde Nebahat Altıok, helbestvan Metin Altıok di Komkujiya Sêwazê de hate kustin. Birâwanîva Altıok Sêwaz“ bî dawîne, hîna jî berdewan e

westeke erêni nîşan daye, lê li hemberî Doza Kurdan bêdeng mane, bi bîr xist û ev rîzîken Ataol Berhamoğlu pêşkêş kirin: ‘Keçîkek bêdeng dimire, dimire li Wietnamê’.

Li ser pirsa me ya bi rengê “Çima wi-sa ye?” Altıokê wiha got: “Di 75 saliya K.T de hebûna gelekî tenê tê pejirandin. Pejirandina hebûna gelên din, di muzikê de wê pirdengiyekê pêk bîne. Wekî tê i-diakîn yekreng nîn e. Lewma rewşenbîrên tirk hîn di vê yekê negihîstine. Komarî gelekî tesîr li wan kiriye.” Bi baweriya Altıokê, rewşenbîrên tirk wisa didine xuyakîrin ku, ew li serpêhatiya

tin.”

### Welat cenazeyan hilna-gire, lê çîrok û helbes-ta vê nayê nivîsin

Nebahat Altıok sersariya nivîskar û helbestvanen tirk a li ser şerê 15 salan jî balkêş û sosret dibîne. Wê da zanîn ku di têkoşîna kurdan de ji salên 1980'yi vir de problemen zor cidî rû dane û pêvajoya şerekî dijwar dest pê kiriye; vî welaftî hew karibûye cenazeyan hilgire, lê ji aliyê rewşenbîran ve, ne helbest ne jî çîroka vî şerî hatiye nivîsin.

Wê behsa serpêhatiya Koçero û helbesta Hasan Hüseyin a li ser wî kir û got

**Gelek kesên din jî li Ciwan Haco guhdarî dikin, lê vê  
pirsê nakin: ‘Gelo ew çima nikare li Tirkîyeyê kon-serekê bide?’ ”**

Komarê vedigerin û rexneyan lê dikin, lê belê di rastiya xwe de ne bi vî rengî ye. Wê got, ew ne jidil in û helwesta wan a bo Komkujiya Sêwazê bi bîr xist: “Kesî sedema pêkhatina bûyerê pirs nekir. Bi sedan polîs, li cihê ku bûyer lê pêk hat, hebûn. Rewşenbîran li bersiva pirsa bingehîn nekoland. Wan xwe ji nasnameya xwe ya muxalîf dûr xist. Si-yaset û huner, her wiha rewşenbîrî, bêmûxalef nabe. Her ci dibe bila bibe, pêwîst e nasnameya muxalîf bê paras-

rewşenbîrên tirk ji zû de ye bi Kêşeya Kurd baş dizanin. Peyre jî got: “Lê rewşenbîrên tirk, îro çavên xwe ji vê rastiyê re digirin. Rewşenbîrên wê demê ku rastiya kurdan dîtiye, îro xwe spartîye ni-jadperestî û şovenîzmê. Ji bo rawestîna şer, ku 15 sal in li dar e, divê dengê xwe bilind bikin. Divê ronakbîrên tirk bêjin, ‘Bes e edî! Bila mirov neyîn kuştin.’ ” Ev xewna min e. Dizanîm ku pêk nayê. Lê bila zarokêne me bijîn. Gültén Akin bi

navê ‘Ji Çiyan re (Dağlara)’ pirtûkî nivîsandibû. Helbesta wê ya bi navê ‘Bes e xwînê bisekinîn’ awazeke gelekî kûr e. Divê bê fêmkirin.”

Li gorî dazanîna Altıok helwesta rewşenbîrên tirk a li hemberî rûdanen cîhanê jî heman sersariyê dihewîne. Wê got ku bo Wietnamê helbest hatin nivîsîn, lê rewşa Kosova û Somâli bala tu kesî nakişîne. Wê da zanîn ku Herêma Balkanan lê hilweşandin, ji çepgir û sosyalîstan deng dernakeve. Her wiha bajarê dîrokî yê herî kevin Baxdat tê bombekirin; angó ‘çîrokîn hezar û yek şevan’ têne tunekirin, kes dengê xwa dernaxe. Altıok li ser vê bêdengiyê diyar kir ku dewlemendiya dîrokî ya cîhanê wekî dîl dixin bin lepê teknolojiyê.

### Apaçî dê wê jî bombe bikin!

Der barê teknolojiyê de jî tiştekî balkêş bala Altıok kişandiye. Li ser fi-rokêni bi navê ‘Apaçî’, ku di şerê Kosovayê de jî, ji aliyê Amerîkayê ve hatin bikaranîn, qala serpêhatiya Apaçîyan kir: “Di şerê Kosovayê de pêşkêşkarên televîzyonan bi heyecaneke zor mezin digot, wê ‘Frokeyên Apaçî’ sirban bom-be bikin. Apaçî, li Amerîkayê navê gele-kî, ku ji holê hatiye rakirin e. We, ew gel ji holê rakiriye, lê hûn bi firokêne wan serbilindiya xwe nîşan didin. Ew jî qewmek bû, lê hatin qirkirin. Çima dema ku ew pêşkêşkar qala firokeyen A-

# Şirk û Kêseya Kurd axivî:

## Şan, lê dengê xwe nakin

**Zerê helbestvanan bêtirs peyva Kurdistan bikar dianî. Ew ji tirsa nikarin helbêstên xwe yên ku di salên 60 û 70'yi de nivisîne, iro bidin çapkiran.**

i dîkin kîfâ wan tê. Ew firoke sibe roj jî bombe bikin...!"

Nebahat Altıok li ser asîmilasyonê, pest otekiya li ser civaka kurd jî dîtinê xwe n zimê û got ligel hemû xebat û hewlêne letê kurdan dev ji kurdayetiyê bernedâ dengê xwe gîhandiye cîhanê. Wê, wi-qala têkoşerî û serpêhatiya kurdan kir: ber ku kurdan, berî niha bi 30–50 salî t bi danîna saziyan nekiriye, iro ji nû ve iyênen xwe datînin. Rojnameyekê ava di-jî aliye dewletê ve tê bombekirin. Ew ejin 'em kurd in', lê bîrdoza fermî dibê-nûn tirk in". Di raporên dewletê de tê dîxîrin ku 4 hezar gund hatine şewitandin, el ve yekê kurd ji tu tiştî xwe nadîn alî û şîna xwe didin."

Altıok, di vî warî de qala serpêhatiyen yên dema mamostetiye jî kir. Navê dêku Nebahat Altıokê lê mamostefî ki-Simanî bûye. Lê dewletê navê gund ki-Kakanî, lê dîsa jî ev bi salan e gundiyan ji navê Simanî bernedaye. Altıokê reakona xwe ya li hemberî wê yekê wiha dikir: "Ev tê ci wateyê? Hema bila navê d Simanî be. Hezar sal e ku wisa tê za-Kurd ji ya xwe nayêñ xwarê. Tirkêñ wî dî jî Simanî dibêjin. Di rastiyê de kurd didine sazibûnê. Ev ziman dewlemeñk e,bihêlin bila bijî. Kesî dil nîn e, vî afî parce bike."

### Êwîst e kurd derewan bikin!

Altıok di vê navberê de li ser ronakbîren û xweifadekirina bi zimanê kurdî jî andinek kir. Bi baweriya wê, ronakn kurd pişti salên 1990'î bi pêş ketine an têkoşîna ziman û dîroka xwe daye. ok axaftina xwe wiha domand: "Ji ber irseyeke ku bi kurdî bikaribe bixwîne nivise tune ye, rewşenbîr tenezar di-Ji ber ku rewşenbîr jî nikare başebaş imanê xwe biaxive, bi zimanekî din iştîya xweifadekirinê dibîne." Wê sa muzîka kurdî jî kir û got, "Kurd di muzîkê de gelekî serketî ne." Wê bal nad ser derketina Ciwan Haco di çape-

meniya Tirkîyeyê de û got: "Derketina Ciwan Haco serketinek e bo kurdan. Gelek kes hez ji muzîka Ciwan Haco dîkin û bî dûvedirêjî li ser wî dimivîsin lê vê pîrsê nakin: 'Gelo ew çîma nikare li Tirkîyeyê kon-serekê bide?'"

Li ser çanda nivîskî, me wekî mînak Yaşar Kemal û Mehmet Uzun dan berhev û jê pîrsî kir. Wê jî pîrsa me wiha bersivand: "Yaşar Kemal ji nû ve dê çawa bikaribe binivise. Ji bo ku bikaribe bi kurdî binivise, divê mamosteyekî baş peyda bike. Lî ji ku derê? Cemal Sureya di helbesteke xwe de wiha dibêje: 'Kurd mecbûr in derewîn, Arnavut jî rastgo bin.' Heman tîrs deh caran zêdetir li ser Yaşar Kemal jî heye. Di salên 1970'yi de peyva Kurdistanê ne di nav neynûkê de dihate bikaranîn. Lî iro mirov nikare weşanxaneyekî peyda bike, da ku wan pirtûkan çap bike." Bi baweriya Nebahat Altıok, Cemal Süreya, Turgut Uyar, Ahmet Muhip Diranas, Süreya Berfede û Ferit Edgü li ser kurdan tiştîn baş nivisîne, lî iro haya kesî ji wan nîn e.

Altıok pirtûkên Mehmed Uzun jî xwendine û gelekî pêşketî dibîne. Wê da xuyakirin ku gelê kurd gelekî têrtijî ye, dema wê pirtûkên Mehmet Uzun xwendine, gotiye ev teqîna daxwaz û hêviyêne gelekî ku gîhandiye hev in. Disa bi baweriya wê ev xebat bingeha romana kurdî ya pêşerojê datîne. Wê got, her cend gelek tiştîn bêqalîte hebin jî, lê hebûna pirtûkxaneyeke kurdî ji her tiştî jî girîngtir e.

### Gelê tirk ketiye taya ere-beyekê!



Cemal Sureya di helbesteke xwe de wiha dibêje: 'Kurd mecbûr in derewîn, Arnavut jî rastgo bin.' Heman tîrs deh aran zêdetir li ser Yaşar Kemal jî heye.

Ji reaksiyona Altıok şowmenên televizyonan jî para xwe standin. Wê diyar kir ku hînek şowmen, di bermameyê televizyonê de, zarî kurdan dîkin. Altıok wiha dirêjâhî da axaftina xwe: "Qaşo kurdan asîmîle dîkin, wan xwestîye kurdan bisibînîn xwe, lê bi ser neketine. Tu zarî xwe jî dîki. Li dînayê mînak gelek in; ji Cezayîr-Fransayê bigirin heta Hindistan-İngilîstanê. Di pirtûkan de em dibînîn ku hemû cezayîfî bi frensî dizanîn, lê asîmilasyona te bi guherandina navê gund, diyar e, bi ser neketî ye."

Altıokê, li ser pîrseke me ya li ser nîqaşa guherîna di civakê de, bal kîşand ser bermameyê televizyonan û helwesta gel. Wê got, "Civak 24 saetan li ber televizyonê ye, ji bo ku pêdiviyêne xwe bi riyeke hêsan û erzan peyda bike, tevî bermameyê pêşbaziyan di-be." Altıok axaftina xwe wiha domand: "Tenê daxwazeke civakê ya bingehîn heye; ew jî xwedîtiya erekbeyekê ye. Ev yek, psîkolojiya şkestî ya civaka tirk dide der. Bi tenê ji aliye dîtbîrî ve civak diguhere. Zarak azad nayêñ perwerdekirin. Pişti salên 1970'yi dersên felsefeyê ji dibistanan hatin rakirin. Felsefe hemû şaxêñ zanyarî eleqedar dike. Lî, ew ji bermameyâ perwerdehiyê tê vederkirin. Nîşşen nû jî bi şeweyekî dogmatîk têne perwerdekirin."

### Kêfa kurdan gelekî ji Metin re dihat

Ber bi dawiyê ve li ser pîrsa me, wê behsa têkiliya Metin Altıok û kurdan kir. Wê got, Metin Altıok ji kurdan gelekî bandor wergirtiye. Metin û Nebahat Altıok salên xwe yên herî xweş û bextewar li Çewligê di nava kurdan de derbas kirine. Li gorî Altıok wan însanan li helbestan guhdarî kiriye û wan hevalê wê Metin Altıok wekî şair bi nav kiriye. Wê da zanîn ku ger Metin Altıok nehatibûya sirgûnkirin, wê ew li Çewligê bi cih bibûna.

Wekî dawîn Altıok der barê hevalê xwe û Komkujiya Sêwazê de hestêne xwe wiha dane der: "Metin pênuşa xwe baş bikar dianî. Wî, 12 pirtûk nivisîn. Helbesta xwe ya li ser Çewligê dewlemlendir kir. Di hevpeyvîneke ku kovara bi navê Sombahar pê re kiriye de, helbesta xwe ya li ser Çewligê, dike du parce; beriya Çewligê û pişti Çewligê. Ez ji bo bûyera wan nabêjîm tevkuyîja ronakbîran. Dibêjîm 'tevkuyîja alewyân.' Wekî ya Maraşê ye. Yek ji wan 'hezar operasyonan' e. Li gorî me ev bûyer bi dawî nebûye. Dadgehê em serwext nekirine. Kesî pîrsa sazûmankarê komkujiye nekir. Dixwazin dozê bi dawî bikin, lê em destûre nadîn."

AZAD ALTUN

Nebahat Altıok, di sala 1945'an de li navçeya Elezîzê Baskê ji dayik bûye. Ew ji mamostetiye malnişîn (teqawîf) e.

Helbestvan Nebahat Altıok, hevjîna Metin Altıok e. Metin Altıok ji helbestvan bû. Wekî tê zanîn, ew di Komkujiya Sêwazê de hate qetilkirin. Doz hîna didome. Encameke li gorî dil û qanûnan nehatiye bidestxistin. Nebahat Altıok (Çetin) ji bilî helbest-



vaniyê, li gelek cihêne Tirkîye û Kurdistanê mamostefî jî kiriye.

Li Çewlig (Bingol) ê 'silav' daye derbeya sala 1980'yi. Pişti derbeyê, ew û hevalê xwe Metin Altıok ji Çewligê hatine sirgûnkirin. Du pirtûkên Nebahat Altıok ên bi navê Janêñ Şoreşê (Devrim Sancıları) û Pirs û Baneşan (Sorular Ünlemeler) hene. Ew, bi eslê xwe kurd e. Bi giranî bi karê helbestvaniyê radibe. Di sala 1996'an de li Enqereyê di nav HADEP'ê de kar kiriye. Berî niha bi 6 salan hatiye Enqereyê. Niha jî ew li Enqereyê dijî. Ew, ji hemû tiştîn li Tirkîyeyê diqewimin bandorê werdigire. Dilê wê jî ji binpêkirina mafîn mirovan jan dide. Ew jî wekî her kesî piştevaniya aştiye dike û dixwaze rojek berî rojekê aşti berê pêlîn xwe bide Tirkîyeyê. Helbesten xwe bi giranî li ser ernîgariya ku lê jiyaye dinivîsinê. Altıok niha jî li ser Çewligê pirtûkekê aminated dike û her wiha nivîskara rojnameya Özgür Bakışe ye.

*Dilê jina kurd kaniya huner û wêje ye*

# Di warê çand û wêjeyê de rola jinê

Ger jina kurd, van hestên xwe yên bi nirx û ewqas jî bi rûmet bîne ser zimên, an bi stranan an bi helbestan an jî li ser kaxizê, wê berhemên bêhempa derkevin holê.

**B**i taybetî, di van salêna dawîn de, em van pirsan tim tînin rojevê; serkeftinênu Tevgera Azadiyê derxistine holê, ji bo ci di warê hunerê de wernegeriyane berhemên binirx? Çima ewqas çavkani nayêni nirxandin? Bi van pirsan re ji rewşenbirêne me û xebatêwan ên kêm têne rexnekirin.

Em dixwazin ji hêleke din nêzîki meselê bibin. Ji bo ku huner û wêje, cihêkî layiqî gelê me bigire, rista (rol) jinê jî pir girîng e. Jina kurd, bi awayekî xwezayî, di wêjeya devkî û nivîskî de pir bikêrhaî ye. Divê rista wê ya di warê huner wêje de jî kêm û biçûk neyê dîtin. Eger em berê xwe bidine dîroka xwe û piçekî lê bikolin, em dê rastiya rista jinê bibin. Lê mixabin lêkolin kêm e; bi vê re jî, jin bi xwe jî vê rastiyê zêde tewa (ciddi) nabîne. Heta xebata çand û hunerê di ser guhê xwe re davêye.

Li aliye din, her çend hîna kêm be jî, jin di warê leşkerî, siyasi, diplomasî de risteke girîng hildigire. Gelek ji wan jî paşê hîni xwendin û nivîsandinê bûne, lê perwerdehiyeke baş standine û xwe bi pêş xistine. Jinê ne tenê bi awayekî aktif di nava şoreşê de, kêm be jî, di nava civakê de jî pêşketinek bi dest xistiyeye. Lê çima ev pêşketin di warê çand, huner û wêjeyê de peyda nabe?

## Jin çavdêreke hûrbîn e

Jin xwedî hestên kur û tenik e. Hestên wê li hember bûyera bêhtir hişyar û bihîstyâr in. Bûyerêni jianê di nava xwe de hîs dike û zûtir pê dihese. Di civaka Kurdistanê de jin çavdêreke hûrbîn û hêja ye. Ji berê de ev rist hilgirtiye. Her çiqas sînor li pêsiya wê danîne jî, çavê wê, ev sînor derbaskirine, giliştine her quncikê civakê. Bêguman çavê wê, hêza xwe ji dilê wê yê germ û hişyar werdigire. Lewre dilê wê tenûra dadayî ye. Agir tê de tim pêketiye. Çav ronahiya xwe ji vî agirî digirin. Lewma çavkaniyeke gelekî dewlemend li ba


jinê heye. Lewre, jin jiyanê diafirîne, zîndîti tim li ba wê heye; dilê jina kurd jî wiha bi xweşî û nexweşiyêni xwe bûye mala jiyanê.

Bêguman, jiyan bê huner û wêje na-be. Bi hunerê jiyan xweşîr û hêşantir dibe, bi xemlî û dewlemend dibe. Bes bi hunerê jiyan çejîartir dibe; kotekî, zahmetî, êş û şahiya jiyanê, bi riya hunerê ya tenik tê fêmkirin. Êş û jan qet dev ji jinê bernadin. Jin, ji nav jiyanekê bindest û dijwar gîhîştiye roja îroyîn, lewma em dibêjin jin çavkaniyeke hunerê ye. Ji ber ku eşâ hestên jinê gîhîştiye radeyeke bilind. Bi xweşî, bi şahî, bi şîn û

ye.

Bi giştî jina kurd di warê dengbêjiyê de xurt bûye, lê dengê wê di nav civakê de derneketiye; di nav sînorêni malbatê de hatiye fetisandin. Her çendî di demê nêzîk de be jî du hozanêni me dengê xwe bilind kirine. Ev jî Meyrem Xan û Eyşe Şan bûne. Ger mirov li şewaza wan binihêre, ne bi tevahî be jî, wê dengê hestên jina kurd bibîne. Ev herdu hozan bûne zimanê jina kurd ê berî şoreşa hemdem.

Em dikarin bibêjin jina kurd, di ber her karê xwe re, bi stran û lawijan xwe ifade dike. Ev stranbêji, karê wê yê gi-



Van dilan bi agirê bedenêni xwe, her kes matmayî hiştine. Lê, cihê xemgîniyê ye, ji aliye huner û wêjeyê ve, ji nava van dilan gelekî kêm kulîlk bişkivîne.

gîrî hestên wê bûne mîna aramekê û hâtine ber fîrandinê. Her çiqas di dîroka Kurdistanê de hunermendêni jin ên navdar kêm rabûne jî, lê ew bi tevahî di nava civakê de bûne hunermendêni bênav. Anglo, her çend yek bi yek derneketine pêş jî, lê hunera civakî xwe bi wan parastiyeye.

Hinek lêkolîner û nivîskarêni biyanî jî ev çavdêri li ser jina kurd anîne zimên. Wekî mînak Bazîl Nîkîtin wiha dibêje: "Di nava civaka kurd de stranê bi awayekî lîrîk jina kurd diafirîne û dibêje." Ev çavdêri gelekî di cih de ye. Awayê lîrîk, bi tenê bi hestên dijwar û bihîstyâr tê afîrandin. Jina kurd agirê nava dilê xwe bi vê şewazê anîye ser zimên; angô stranê lîrîk jî nav tenûra dadayî dertêni û çavkaniya wan jî ew bû-

ran li wê hêşantir û xweşîr dike. Lewma li gorî karê xwe stran çêkirine. Wekî mînak; destar, dankutan, bêrî, paleyi, hejikçimîn, avkêsan, dergûshejan.

Îcar lawij û dîlokên evînan û hwd. jî pir cihêkî girîng digirin. Bêguman di vê wêjeya devkî de hestên şahî û şîniyê bi hev re ne. Anglo hem li dawet û dîlanan hem jî li ber gor û darbetan jî dilobêjan dibêje. Bi kurtasî, jina kurd her çiqas xwedî dilekî hunerbar be jî, fersend nedîtiye ku vî dîlî bi awayekî baş veke û civaka xwe bikemiline. Lewma hêza xwe ya hunerî da tevn û xalîyên belek, daye dezge û tayêni rengîn. Hestên xwe yên axîn û hêviyêni xwe li ser van neqîşandine. Lewre fersendeke din tunebû.

Bi rabûna Tevgera Azadiyê re ev dil bûn êtûn, berq û diteqin; bûne alav ber

bi ezmanan ve hildifirin, xwe disewi nin jî. Bêlê van dilan bi agirê beden xwe, her kes matmayî hiştine. Lê, ci daxbarî û xemgîniyê ye, ji aliye huner û wêjeyê ve, ji nava van dilan gele kêm kulîlk bişkivîne. Ew kulîlk bişkivîne jî, zêde çavkaniya xwe ifâ nekirine an jî li ber vê mezîniyê kêm cminin.

Ger jina kurd, van hestên xwe yi binirx û ewqas jî bi rûmet bîne s zimên, an bi stranan an bi helbestan : jî li ser kaxizê, wê berhemên bêhempa derkevin holê. Ji bo ku mirov vî karî t ke, ne şert e ku navê rewşenbirîyê li s mirov hebe. İro jina kurd dibê şahî şer; zîlm û zorê, dayina bedel û dibê ş hidê şoreşekê. Ne tenê şahid e, di h man demê de dijî jî. Di hestên xwe di raman û kesayetiya xwe de şoreşê çike. Hestên wê di bihara jiyana wê de n Ger têkoşînekî di vî warî bide, wê ris wê di nav civakê bilind bibe. Belki di hêlê de, carêni pêşîn, tu berhemî berbiçav bi dest nekevin, lê ev yek gel kî xwezayî ye. Lewre destpêka her tiş heye. Wê pêşîn bi helbestekê, bi stran kê, bi kurteçirokekê, bi kurtelistikel dest pê bike. Peyre wê hêdî hêdî xvî û çêja wê jî bê dîtin. Ü wê jin şahî di karê xwe de bîne zimên û di nav kî raniya dilê xwe de bihesibîne. Wê jî kurd li hunerê germ bibe, çawa ku li s yaset û leşkeriyê germ bûye.

## Divê jina kurd dilê xwe veke

Em gelek caran dibînîn keçikîn cwan rojnevîşkan dînîvîsin; gelek helbê û nivîsen xweş û biwate dînîvîsin. Lî t carî van hestên xwe bi civakê re par ne kirine, ji ber ku wan zêde watedar û hêj nabînin. Ew pê ne bawer in ku ew hestên wan wê bikevin xizmeta bipêşketin jinê û ya têkoşînê. Heta wan hest û berheman şexsî dibînîn û ji xwe re ve dişerîn. An na di roja me de, bi baweri ya me, astengê civakî ne mane, asten gî hinekî em bi xwe ne. Ev hest û hewî danan biçûk û bêkêr dibînîn. Ji bo ku e girîngiye hestan bê fêmkirin û hinek ce saref bêne dayîn, divê hinek huner mendêni jin û saziyêni kurdan bibin alîkar û wê li karûbarê huner û wêjey germ bikin. Lewre jineke azad, çawa ku divê bibe xwediya hêzeke siyasi, leşkerî û diplomasî, divê bibe xwedi hêzeke hunerî jî. Jina azad bêhuner û wê nabe.

# Li Tîmora Rojhilat kontra gub nadin peymanê Referandûma serxwebûnê hate taloqkirin



Nûnerê NY'ê bi Serokê Tevgera Tîmora Rojhilat Xanana Gusmao (yê aliyê çepê) re li girtîgehê hevdîtin pêk anî.

## ★ BEŞA NÜCEYÊN DERVE


**S**erokê Neteweyên Yekbûyi bo du hefteyan referandûma li Tîmora Rojhilat, ku diviyabû di 8'ê gelawêjê de pêk bîhata, taloq kir. Li gorî agahiyên ku roja 23'yê pûşperê ajansên nûçeyan ragihandin, ji ber êrîşen tund ên hêzên çekdar, ên ku piştevaniya yekîtiya bi Endonezyayê re dîkin û hêzên Endonezyayê, NY'ê ev biryar girtiye. Sekreterê Giştî NY'ê Kofi Annan da zanîn ku gelê serxwebûnxwaz, ji hêla hêzên dewleta Endonezyayê û hevalbendên wê ve têne kuştin, gef li wan tê xwarin û geleb gundi têne koçberkirin.

Her çiqas Sekreterê Giştî yê NY'ê dema biryara taloqkirinê ragihand mêmüyeke teqeze neda be jî, qala roja 21 an jî 22'yê gelawêjê tê kirin. Annan di axaftina xwe de diyar kir ku wê referandûm teqeze di nava meha gelawêjê de pêk were. Li hêla din, li gorî heman çavkaniyan rayedarên Endonezyayê naxwazin referandûm roja yekşemê pêk were, lewre ew ditirsin ku serokên dêrê dê di axaftinê xwe yên li dêran de propagandaya serxwebûnê bikin.

Ev êrîş, digel astengkirina mafê gelê Tîmora Rojhilat, ewletiya canê peywirdarên NY'ê, ku diviyabû bîhatana herêmê jî, dixe xetereyê. Li gorî peymanê divê 270 ji wan polisên sivil, 50 jî leşker, 900 pey-

wîrdarên NY'ê di dema referandûmê de li herêmê xebatê bikin. Annan da zanîn ku ewê di 13'ê tîrmehê de dest bi qeydkirina hilbijêran bikin.

Her çiqas rayedarên Endonezyayê vê yekê nepejirin jî,



Sekreterê Giştî yê NY'ê Kofi Annan

çavkaniyên cur bi cur diyar dîkin ku êrîş ji hêla hêzên kontrayî ve li ser mirovên serxwebûnxwaz tê kirin. Li gorî raporeke nû ya Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî, ji bo ku rê li ber serxwebûnê bigirin, hêzên kontrayî û hêzên Endonezyayê di nav çar hefteyan de 34 kes kuştin. Raporâ navborî di 21'ê pûşperê de li

Li gorî peymana ku hatibû girêdan, diviyabû di 8'ê gelawêjê de 400 hezar hilbijêren tîmorî biçûna ser sandoqan. Lê, hêzên Endonezyayê û hevkaren wê nahêlin ku gelê Tîmora Rojhilat daxwaza xwe ya bo serxwebûnê bîne cih.

Sydneya Nemsayê (Awusturalya) hatiye belavkirin. Raporê daye zanîn ku di navbera 5'ê gulanê û 10'ê pûşperê de digel kuştina 34 kes 280 kes jî bi awayekî ketûber û keyfi hatine binçavkirin. Li gorî raporê bi hezaran mirov jî hatine koçberkirin. Di dawiya raporê de hatiye xwestin ku heta dawî li van êrîşan neyê, referandûm neyê lidarxistin.

Li gorî peymana ku di navbera Endonezya û Portekîzê de hatibû girêdan, diviyabû di 8'ê gelawêjê de 400 hezar hilbijêren tîmorî, ku nîvê şeniyê herêmê ye, ji bo diyarkirina helwesta xwe ya li hemberî dewleta Endonezyayê biçûna ser sandoqan. Lê, hêzên Endonezyayê û hevalbendên wê bi van êrîşan nahêlin ku gelê Tîmora Rojhilat daxwaza xwe ya bo serxwebûnê bîne cih.

Her wekî tê zanîn Tîmora Rojhilat heta sala 1975'an mêtîngîha Portekîzê bû, di sala 1975'an de ji hêla Endonezyayê ve hate dagirkirin, lê, gelê herêmê ev yek nepejirand û li ber xwe da. Niha jî Serokê Tevgerê Azadixwaz a Tîmora Rojhilat Xanana Gusmao di girtîgehê de ye. Her wiha li gorî agahiyên ku bi dest ketine Gusmao jî bi daxuyaniyeke ku ji girtîgehê ragihandiye, piştgiriya xwe ji bo biryara NY'ê diyar kiriye. Lê, xwestiye ku ji bo ku çareseriye xebat û gotûbêj bidomin.

## DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

USA TODAY

NATO divê ji ber endamtiya Tîrikyeyê şerm bike

✓ Rojnameya Amerîkayê ya bi navê USA TODAY, di hejmara xwe ya di 17'ê pûşperê de, cih daye nirxandineke lêkolînerê Înstituya CATO Doug Bandow (pisporê siyasetê yê serokê Amerîkayê yê berê Ronald Reagan). Di vê gotarê de hevrûkirina rewşa li Kurdistanê û Kosowayê hatiye kirin û di dawiyê de hatiye diyarkirin ku rewşa li Kurdistanê ji ya li Kosowayê kambaxtir e. Her wiha hatiye gotin ku Tîrkiye mafê çandî û zimanî yê 12 milyon kurdî înkâr dike û mafêni mirov binpê dike. Di dawiya nivîse de tê xwestin ku NATO û Amerîka dewleta tîrk jî wekî Sîrbistanê bîne ser riya rast.

New York Times

Gotinê Öcalan fikra gelek kesan guhart

✓ Nivîskarê rojnameya New York Timesê Stephen Kinzer roja 22'yê pûşperê li ser Doza Sedsalê nûçeyek amade kiriye. Di nûçeyê de hatiye gotin ku berî destpêkirina dadgehê gelek kesan dixwest Öcalan bê bidarvekirin, lê piştî gotinê Öcalan ên dadgehê, ev ditin guheriye, êdî gelek kes dixwazin ku samîmiyeta Öcalan bê pîvandin. Di nûçeyê de piştevaniya PKK'ê ya bo Öcalan û pêşniyazên HADEP'ê yê ji bo çareseriye jî cih girtiye. Her wiha di nûçeyê de hatiye gotin ku serokê Rêxistina Parastina Qanûna Bingehîn a Almanyayê xwestiye ku rê li ber darvekirina Öcalan bê girtin. Li gorî nûçeyê wî ji dîplomatê alman xwestiye ku ji bo vê yekê ci pêwîst bê bikin.

AFP

Öcalan banga xwe ya aştiyê dubare kir

✓ Ajansa nûçeyan a navneteweyî AFP'ê roja 23'yê pûşperê li ser Doza Sedsalê nûçeyek belav kiriye. Di nûçeyê de hatiye daxuyandin ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan daxwaza xwe ya ji bo aşî Ü çareseriye dubare kiriye. Li gorî nûçeyê Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan gotiye, "Ev serhildana PKK'ê divê bibe serhildana dawîn". Dîsa di nûçeyê de hatiye daxuyandin ku Öcalan ji bo vê yekê mafê pêşvebirin û bikaranîa zimanî kurdî, di warê weşanî û jiyana taybet de xwestiye. Di nûçeyê de hatiye gotin ku Öcalan daye zanîn ku bi kuştina wî tiştek çareser

Gelo ez li tatîlê çi bikim?

# Dersa herî xweş,

# lîstik û çîrok e

Z arokê/o, ger tu dixwazî, hinekî li min guhdarî bike. Lê tu bi kêfa xwe yî. Ji ber ku, pirî caran, tu bêyî dilê xwe li gelek tiştan guhdariyê dikû. Bavê te an jî hin kesên din, bang li te dikin, tu jî bi darê zorê diçî cem wan. Di ser de jî şimaq û şimik xelata te ne! Carina jî şimik dibe mohra pişta te...!

Neçe... Nere....! Îdfî neçe cem wan. Bila ew werin cem te. Dema dê û bavê te rahiştê şimikê, bêje wan “Tu polîs i, ma ev der qereqol e”. Dê û bavêni bi vî rengî “qoricî û axayê” dewletê ne! Ji bavê xwe bipirse: Çima ew her tim li serê sifreyê rûdine? Çima hûn li ber wî radibin? Çima hûn nikarin li ber wî bipeyivin? Û ji bo çi hûn destê wî maçî dikin? Çima kûmandaya televîzyonê her tim di destê wî de ye? Binihêre... axa tim li ser sifreyê rûdinin û destê xwe didin maçikirin.

Lewma nema destê bavê xwe maçî bike û êdfî li ber bavê xwe an jî hin kesên din ranebe. Ma tu leşkerî, bavê te qûmandar e! Û kûmandaya televîzyonê ji destê bavê xwe bigire, bi têra xwe li xêz-filman (çizgi film) binihêre. Dema gazi te kir, bêje wî “Karê min heye, ezê paşê werim.” Ger dê û bavê te, bersiva (cevap) pirsên te nedan, heyâ te bersiva xwe nestand, dev ji wan bernede. Û wan ger ji te re got: “Keça min, kurê min! Leglegê tu anî” tu caran jê bawer neke. Ji bîr neke, dê û bav her tim rastiyê nabêjîn û a rast nakin jî. Rastiyê tu dibêjî. Lewma ji te ditirsin; an te bêdeng dikin an jî dibêjîn “Tu hê biçûk i, bi van tiştan nizanî.” Ci ji dilê te hat, bêje, dilê te rast û zelal e. Ma cara pêşin te negotibû “Qral tazî ye!”. Mezin dixwazin, tu wekî wan bî, lê tu “mezin” nebî.

\*\*\*

Dema tu raketî, bêje dê û bavê xwe, bila ji te re çirokan bêjin an jî bixwînin. Ji bîr neke, çirok ji hemû dersan xweşîr in. Lewma bêçirok ranezê. Gava wan ji te re çirok negotin, here li ber deriyê odaya wan bisekine, nehêle ew rakevin... Malê li wan xira bike! Ku nizanîn jî bila hîn bibin. Tu jî sparteyê (ödev) bide dê û bavê xwe, bila çirok, lîstik û stranan hîn bibin. Dema wan nekir, nehêle ew werin malê.

Ez dixwazim tu vî tiştî qet ji bîra nekî: Lîstik kar û wezîfeya zarokan e! Lîstik dibistana herî baş û bikêr e. Ez nabêjîm li dersen xwe nexebite, bêders nabe. Lê dersa herî xweş û fêrkar (ögretici) lîstik e. Ger tu bi têra xwe nelîzî, li mektebê jî tu bi ser nakevî.

Ha tatîl tê... Van rojan tê karneya xwe bistîni. Ez bawer im tirs û xofeke mezin di dilê te de heye. Ku 10 “golikê (zeîf)” te jî hebin, qet xeman nexwe,

Lîstik kar û wezîfeya zarokan e! Lîstik dibistana herî baş û bikêr e. Ez nabêjîm li dersa xwe nexebite, bêders nabe. Lê dersa herî xweş û fêrkar lîstik e. Ger tu bi têra xwe nelîzî, li mektebê jî tu bi ser nakevî.



Netirse! Carna ji dibistanê bireve û bi kêfa xwe bigere. Here diciya bostan û rezan, lê bila yên muxtar û qoriciyan bin... Lastika çûka ji xwe re çêke, li çivîk û maran berde. Carina jî, bi dizî, keviran li serê muxtar û qoriciyan berde.

berê xwe bide lîstikê. Wê ji te re bêjin, “Keç û kurê xelkê taqdîr û teşekkûr standiye!” Tu jî karneyê biçirîne, bavêje nav çavên wan bide û bêje “Lîstik jiyan e.” lêxe here. Dê û bavê te, te weki “hespê bezê” bi kar tînin; ji ber ku wan nekariye bibin doxtor û avûkat, dixwazin bi riya te, vê daxwaza xwe pek bîmin. Ew ji bo menfeata xwe te dixebeitînin. Bi wan nexape. Bixwîne... Bixwîne, lê ji bo tu bîbi “mirovekî/e bas”, ne “zilamekî bas”.

Netirse! Carna ji dibistanê bireve û bi kêfa xwe bigere. Gava mamosteyan li te xist, li ber rabe û bêje “Ez te nas nakim. Ma ev der qereqol e!” Ji her kesî re bêje, dengê xwe bigihîne heft qatêñ ezmîn...! Tu bi zimanê wan dixwînî û ew te biçûk dibînîn, lê disa jî tu serketî yî. Ew ji bo zarokêni ku bi îngîlîzî dixwînîn, sal an jî du salan haziriyyê dikin, lê tu yekser dest bi dibistana bi tirkî dikî. Lewre qet xeman nexwe, tu serketî yî.

Here diciya bostan û rezan, lê bila yên muxtar û qoriciyan bin... Piştre dakeve bexçeyê zebeş, petêx, sêv, incas û hinaran. Dema tu bi şev biçî, baştîr e.

Lewma li ber şewqa heyvî (hîveronê) tama zebeş û sêvan gelekî xweş e. Kêrika xwe jî ji bîr neke. Gava te ev fêkî xwarin, bila zarokêni selpakfiroş û gundê wan ên şewitandî ji bîra te neçin. Hilkişer spindaran û darebiyan, bi têra xwe bihejîne an jî hêlanekê çêke. Lastika çûka ji xwe re (kevirkanikekê) çêke, li çivîk û maran berde. Carina jî, bi dizî, keviran li serê muxtar û qoriciyan berde; camen wan jî bişkîne...! Dawiyê ji xwe re bafirokekê (uçurtma) çêke û li ezmîn berde. Ku kesk û sor û zer be, baştîr e, lê tu zanî.

Tiştê herî muhîm min hişt dawiyê; ziman. Dê û bavê te, bi te re bi tirkî, erebî, farisî dipeyivin, tu dibê qey peyvandina bi kurdi sûc û guneh e.

Derewan jî dikin, dibêjîn. “Ji ber ku zarokê me diçe dibistana tirkî em pê re bi tirkî dipeyivin. Bila dersê wî/wê baş bin” Derew... derew... Çunkî dema tu biçî dibistana îngîlîzî, ji tirkiya te re dengê xwe nakin. Dixwazin tu hînî îngîlîzî bibî, lê naxwazin tu hînî kurdi bibî. Ew ji ziman û kultura xwe şerm û fedî dikin. Gelek ji wan jî dibêjîn, “Em welatparêz in” Tu caran ji welat-

parêziya wan bawer neke. Gelek ji wan, ên welatparêz, li Ewrûpayê jî bi zarokêni xwe re bi tirkî dipeyivin. Ma li Ewrûpayê jî dibistana tirkân hene....! Ji ber ku ew ji zimanê xwe şerm dikin, tu jî dibê qey kurdi tiştêkî pis û qirêj e. Ji bo vê yekê, dema dê û bavê te bi kurdi bizanibin û bi te re bi kurdi neaxivin, bêje “Ez we wekî dê û bav qebûl nakim.” û tu caran bi wan re nepeyive, heyâ ku bi zimanê te yê zikmaki, kurdi nepeyivin. Lê... tu caran dijminatiya tirkî, erebî, farisî, îngîlîzî neke. Ger dê û bavê te bêjin “Bi tenê bi kurdi bipeyive”, li ber wan ranebe û hînî van ziman jî bibe.

Ha yek jî, ger diya te got “Keça min, vê êvara hanê dernekeve, tu ne lawik i” Tu jî bêje, “Ez naxwazim wekî te bibim kole” lêxe here.

Li vir, em hatin dawiyê, min hin tişt gotin, lê tu bifikirî gelo rast in an na? Ez nabêjîm ez tiştîn rast dibêjîm, ger tu jî dîtinê xwe binivisi, ez dê gelekî kîfxweş bibim. Di nava lîstik û çirokan de bimîne.... Listîk Jiyan e.

Ji weşanxaneya Aramê berhemeke nû:

# 'Kes nikare roja me tarî bike'

Weşanxaneya Aramê piştî pirtûka "Liceli Delikanlı" pirtûkeke din, li ser çalakiyên xweşewitandinê yén bi dirûşma "Kes nikare roja me tarî bike", bi amedakariya Zeki Akıl weşand. Naveroka pirtûkê li ser çalakiyên xweşewitandinê ye ku li dijî komploya navneteweyî ya li hember Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan pêk hatibûn.

Pirtûka ku ji 180 rûpelî pêk tê, ji komploya 1993'yan dest pê dike li ser suikasta 1996'an a li Şamê li hemberi Serokê PKK'ê disekine û bi komploya "zîrveyê" ya 9'ê kewçêra 1998'an girê dide. Akıl, komploya 9'ê kewçêre di pirtûkê de wiha tîne zimên: "Çaxê ku qala qeyrana Suriyeyê kir, wan pêl li pişkova (düğme) komploya mezin kîribû. Li Iskenderunê tettîqata NATO'yê, li Behra Spî (Akdeniz) keştiyên şer ên DYB'ê, li sînor teknolojiya şer a herî dawîn û leşker kîşandibûn ser hev. Di heman demê de li hemberî şerawestinê operasyon zêde kiribûn û li Başûr jî bi hevkariya PDK'ê li hember gerîla vez dabûn livbazîyan û li hemberî MED-TV'ê jî sinyal şandin." Akıl wiha didomîne: "Serok Apo bi du-



re  
bîniya xwe  
tenê ev komplot nedît, di  
heman katê de ev plan bi zanabûna  
xwe di avê de bir."

Zeki Akıl, piştî van bûyeran li ser derketina Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan a ji Şamê û çûyîna wî ya Rûsyayê û pişt re jî li ser çûyîna wî ya Romayê û grevên birçibûnê, xwepêşandanen ku pêk hatibûn disekine. Lî bi piranî di pirtûkê de tiştî ku li ser hatiye rawestandin, çalakiyên ku li hemberî komploye "Bûn bendêni ji êgir" e. Ew pêşî li ser çalakiya M. Halit Oral disekine.

M. Halit Oral çalakî di şeva ku 8'ê kewçêre bi 9'ê kewçêra 1998'an ve girê dide pêk anîbû ku ev çalakî di nav van çalakiyan de ya yekemîn e. Akıl, destpêkirina çalakiya Oral ji devê hevalên wî wiha ragihandiye: "Di qawîşa xwe de bi bêdengî dadikeve xwarê, ji wir bîdoneke kolonyayê digire û hildikişê jor. Kincên xwe derdixe û di binî de pîjmayeke naylon, di ser de fanêreyekî (tîşortek) naylon û di ser wî de jî içlikek (gömlék) naylon li xwe dike. Bi bona naylon ku bi destê xwe çêkîribû deriyê hucreyê bi du cihan girê dide" û wiha didomîne: "Ew êdî tîra ku ji kevanê derketiye ye, kes nikare bide sekinandin."

Akıl, di pirtûkê de li ser çalakiyên ku pêk hatine disekine û yet bi yet dinirxîne. Her wiha di pirtûkê de listeyeke navên kesen ku di wê demê de çalakî pêk anîne jî hatiye weşandin. Di beşâ dawîn a pirtûkê de jî bi sernavê "belgeler", nameyen çalakvanan ku berî çalakiyan nivîsinê û ji bo hevrîyên xwe hiştine, hatiye weşandin. Ev pirtûk wê ji bo pirtûkhaneyan wekî belge-nameyekê bimîne.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Nûbihar derket

Kovara mehane ya çandî, hunerî û wêjeyî Nûbihar bi hejmara xwe ya meha adarê derket pêşberî xwendevanen xwe.

Di destpêka hejmarê de nivîsa bi sernavê "Bi Xatîre We" ya berpirsyarê giştî Sabah Kara heye. Di nivîse de Sabah Kara diyar dike ji ber ku ew li Ewrûpayê ye û berî weşanê nivîsen kovarê nabîne, karê berpirsyariya giştî nema dikare bimeşîne.


Piştî nivîsa Sabah Kara nivîsa bi sernavê "Bawerî, fedakarî û sebirkin" ya Süleyman Çevik cih digre. Çevik di gotara xwe de li ser kurtediroka Nûbiharê rawestiyaye. Ew dide zanîn ku ev şes sal in digel hemû zehmetî û astengîyan kovar der ketiye û bi vî awayî ketiye sala xwe ya heftan. Her wiha Çevik balê dikşîne ser zêdebûna weşanen kurdî li gorî deh-panzdeh sal berê û digel vê yekê kembûna xwendevanen kurdî.

Di hejmerê de nivîsek din ku balê dikşîne ser xwe jî nivîsa bi sernavê "Girîngiya Kovaran" a Selman Dilovan e. Dilovan di nivîsa xwe de li ser kovargeriyê rawestiyaye û merhaleyn kovargeriyê xal bi xal raxistîne ber çavan.

Ji bili van nivîsan çend nivîsen ku di hejmarê de cih digirin ev in: 'Bila kuştin tune be (R. Karakaya)', 'Ji bo dîrok dîsa dubare nebe (Rauf Çiçek)', 'Hinek felsefe, hinek hêvî (Memê Alan)', 'Çiroka Xezebê-helbest (Rînas Jîyan)', 'Yar xewna jiyanê ye-helbest (M. Hemo)'.

## Pelîn

OSMAN ÖZÇELİK



E v demeke dirêj e ku min digot kovareke me hebûya; kovareke hunerî, edebî û çandî... Ji ber ku min dizanî meyla me, ji afirandinê bêhtir li ser xwestin û rexneyê ye û em ji afirandinê zêdetir ji rexnekirinê hez dîkin. Min ev doz û daxwaz bi deng nedikir. Dîkaribû ji min re bihata gotin, ma kî bi destê te girtiye û kî nahêle ku tu pêşkêsiya xebateke wisa bikî.

Weşanen me yên politîk, têra pêdiviya me neke jî, mirov dikare bêje, di vî wařî de kîmasyek, valahiyeke mezin nîn e. Heke politîka bi hunera bedew, bi wêjeyeke rind, bi çandeke kûr neyê avdan, naxemile, nakemile, bejî û rîjî dimîne.

Em di dema ji edebiyata devkî derbasî edebiyata nivîskî de ne. Bi saya serê hunermendîn me yên çîrokbêj, dengbêj û xweşbêjan, ziman, huner û edebiyata me, ji nav lepêñ cînawirêni pişäftin û jibîrkîrinê xilas bûne. Çand û edebiyat ji qîrn û nifşen

kevn, mîna zincîrekê derbasî qîrnê nû bûye û hêj zincîr neqetiyaye. Belê dem dijwar e, di vê dema ragihandinê de 'lez' wateyeke nû dide demê û dem nikare xwe li ber lezê rabigire. Her wiha hunermendîn edebiyata devkî ji nikarin xwe li ber demê rabigirin û roj bi roj kêm dibin.

Ji bo liseravakirina edebiyata nûjen û pêşketî, bingehêke xurt divê. Bingehê edebiyata me zaf xurt e. Belê jê re berhevkirin û nivîsin divê. Ji karê afirandin û nivîsinê re jî bawerî û heyecan divê. Divê mirov bi xwe bawer be û bêtirs be. Mirov ji şaşî û çewtiyan, ji xeletî û kîmasîyan bitirse, destê mirov ji kar sar dibe. Lazim e mirov; baweriyê bi ïnadê, ïnadê jî bi sebatê ve bîhûne.

A. Zeki Okçuoğlu, ji wan kesan yet e ku baweriyete xurt bi ïnadeke mezin dirêse. Ji pêşkêsiya notiyê natirse û her tim li pey afirandina pêwîstiyen cuda ye. Ahmet wekî berhemên hêja diyarî kitêbxaneyâ kurdî dike. Piştî 'salnameya roj'ê (ku di warê xwe de ya yekemîn e), kovara 'Serbestî' bi tirkî derxist. Niha jî bi navê Pelîn kovareke edebî bi zimanê kurdî digîhîne ber desten xwendevanen kurd.

Pelînê di hejmara yekemîn de cih daye hevpeyvîn, lêkolînê li ser zimên, werger û


gelek şairên kurd ên nûjen. Nivîsen di Pelîn de cih girtiye, kalîteyeke berbiçav nîşan didin.

Kaxiz, cîlt, tîprêzî, mîzanpaj û berga kovarê qet gumanê nahêle ku Pelîn bi destê pisporan dertê.

Di sernivîsa 'Hinek din ronahî' de İ. Seydo Aydoğan radîgîhîne ku wê Pelîn, li ser şopa rojnameya 'Kurdistan'a 101 sal berê ji aliyê M. Miqdat Bedirxan ve li Kahîreyê hatiye weşandin, bimeşe. Ü İ. Seydo Aydoğan dibêje 'Em jî mîratxwîren hawarê ne. Ci şîretên ku di wê de hatibûn kîrin, mîna ku li me hatibin kîrin emê bixebitin.' Ev gotin û dîtin dike ku em bêhtir ji kovarê hez bikin.

Bengîn Amedî di nivîsa bi navê 'Di zimên de gaveke girîng: Diksiyon' de bala xwendevanen dîkişîne ser rastpeyvîn û xweşpeyvîna kurdî. Ev mijareke zaf girîng e û ez hêvî dikim ku wê Pelîn li ser vê mijarê baş raweste.

Xwendevanen heja, ez dizanim di van rojan de guhê we li ser darizandina 'İmrâlîyê ye û hûn ne neheq in. Belê jiyan berdewam e û pêwîstiya me bi hinek rengîn xweşik jî heye. Ji ber ku Pelîn rengekî ronî ye, min xwest bi we re vî rengî par bikim.'



Xebate bawerî û fedakarîya  
Kara sala heftan

# Masîgirtina du faşîstan

Du faşist diçin ku masiyan bigirin. Pişti hewldaneke dijwar, encam tenê masiyekî piçûk e. Yek ji wan dibêje:

– Eger em hemû mesrefa xwe hesab bikin, ev masî bi du mîlyonan ji me re dimîne.

– Wey Xwedêyo, spas ji bo te ku me zêdetir negirtin.

## Neynik

Yek ji hevalê xwe re dibêje:

– Tu feyde di awêneyan (neynikan) de tune ye.

Hevalê wî bersiv da: “Çima, na?” Wî dîsa lê vegeand û got:

– Ci dema ku ez lê dinêrim, kesek tê ber çavên min û nahêle ez tiştekî bibînim.

## Kîjan

Carekê turistik îngiliz ji bo gerê tê Kurdistanê. Ew, pir ji çiyayê Kurdistanê hez dike û dixwaze ku navê wan hîn bibe. Ji kurdekkî ku bi îngilizî nizane, dipirse: “Navê wî çiyayê hanê ci ye?”

Yê kurd bersivê dide: “Kîjan çiya?”

Yê Îngiliz got: “Gelek spas. Ma navê yê din ci ye?”

## Emê heta hetayê li hewa bimînin

Yek di balafirê deye. Pişti demeke firînê kaptanê balafirê bang dike:



– Rêwiyyê hêja. Yek ji motorên balafirê rawestiyaye lê netirsin û nekevin panikê, ji ber ku balafir dikare bi sê motoran jî bifire.

Pişti bîstikekê dîsan bangek nû tê:

– Rêwiyyê hêja, du motorên din jî

rawestîne lê dîsan pêwîst nake ku hûn bitîrsin. Ji ber ku balafir dikare bi motorekê jî dakeve.

Hingê yê di balafirrê de rûnişî, pir tîrsiya û ji xwe re got:

-Xwedêyo, tu nekî ku motora dawîn bitemire. Ma ger ew jî temirî, emê heta hetayê li hewa bimînin.

## Kirawat teng e

Zilamek ji xwe re kirawat tekê dikire. Lî dîsa li kirawat-firoş vedi gerîne.

Kirawatfiroş dipirse: “Çima te bi pas de anî, ma ne baş bû? Ma rengê wê ne xweşik e?”

Zilam bersiv da: “Na, tu xerabî di reng de tune ye lê kirawat ji min re teng e.”

## Guhê winda

Qezayek tê serê yekî. Guhê wî je dibe. Hevalê yê ku pê re bîskekê di lêgerîna guhê wî de alîkariya wî dike. Guh dibînin. Lî xwediyê guh dibêje “Na, ev ne guhê min e. Mîna niha tê bîra min ku pêñûs di pişt guhê min de hebû.”

## Tiliyên min ne wekî hev in

Yek ji yê din pîrsî: “Çima desten te herdem di bêrîkên te de ne?”

Yê din bersiv da: “Ez şerm dikim, ji ber ku tîliyên min hemû ne bi qasî hev, dirêj in.”

## Televîzyon girt

Yek ji Tirkîyeyê li televîzyonê temâse dike. Lî ew televîzyonê digire. Hevala wî jê dipirse: “Çima te girt?”

– Ez ê biçim tuwaletê, lewre ez naxwazim ku beşek ji programê, nedîti bimîne.

## Saet çiye?

Yek saetê dipirse, yê din bersiv dide: “Anîha ji bîra min çû; nizanîm ka hevalê min, wê saet li 9.30’ı an ji 3.90’ı were!”

BERHEVKAR: H. M. ZAXOYÎ

## XACEPIRSA BI XELAT (178)

Elaçığın Düzençisi Ortaç Şenol		P		Denge Mehmet		T		B		Cihangir Avni		T		Zîn Aremi M. P.				
B	İ	E	T	A	M	T	Ş	A	K	A	R	R	E	B	R	O	R	I
R	E	B	R	A	B	R	A	B	O	R	I	L	E	D	A	N	M	A
Z	A	R	D	I	Y	A	R	I										
M	E	D	T	A	R	R	A	N										
R	D	I	L	O	X													
J	Y	A	E	I	X													
A	X	D	A	M	A													
H	A	K	I	A	V													

### Bersiva Xacepirsa 176'an

Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxîn û bi riya peşkê li 5 keşan belav bikin. Xelata hejmara me ya 178'an Pirtûka Weşanx-aneya Aram 'Günesimizi Karartamazsiniz' e

#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyen li bin xacepîrsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesen ku xelata hejmara 176'an Kasetan 'Newroz û Nazê' qezencî kirine ev in: Berxwedan Dalgic/Antalya, Ayten Yeqin/Merdin, Cemal Kaya/Edene, Recep Minas/Sert, Yilmaz Demirci/ Merdin,

Bajareki Kurdistan ê Serokê Mehabade	Bangkirin ↓ Madeneki hêja	Antî	Dewletekî kurdan a kevn Kesê bi hêvi	Psikoloji ↓ Cawbir	Dengdaré n daket
Zilam	Çavkani				
Jêkirin	Tipa dû m'yê		Tipa beri w'yê	Xwarina mirîşkan	
Tipa dû s'yê	Sembola iyotê	Menzere			5
Dîni		Kesê ji taqetê keti			Tipa beri n'yê
3		Hejmarek berepaşki		Ziv	
Sembola oksijenê	Sile			Lehengê Newrozê	
Sembola argonê	Bazara fêkî û mêwyan	Awa			
Ali			Xwedayek		
Cetwelek			Ne kevn		
Suç	4		Tipeke kurdî		
Parlement era kurd a AP'e yê			Sembola karbonê		



1 2 3 4 5

IKAYA

BÊJING

sekû

## Konsey ra çekerdinê Tirkiye ame rojev

Mecîsa Konseya Parlementeranê Ewropa kombiyayinê xoyê amnanî 22'ye menga pûşpera 1999 de virast. Kombiyayin de raporo ke parlementerê macarij Andreas Barsony kerdi hedire, ame rojev.

Parlementerê macarij Andreas Barsony ke Doza Sesere Girawê Îmralî de nameyê Konseyê Ewropa ya temase kerdibi, raporek pêskêş kerdi.


Barsony raporî ser kombiyayin de qisey kerd ûderheqê Serokê Gistî yê PKK Öcalanî de cezayê idamî wasten rexne kerd, bado jî ard vîrî ke cezayê idamî goreyê normanê Ewropa niyo ûiyê Doza Sesere nezdî ra temase kenê.

Kombiyayin de endamê Partiya ep a Swed Maggi Mikaelssonî jî vat ke, eke dewleta Tirkiye cezayê idamî bido Öcalanî iyê Tirkiye Konseyê Ewropa ra çekerdin (estin) biyarê rojev. Mikaelssonî sîcîlê lîminê (qilîrînê) haqê mardimanê Tirkiye ard vîrî ûwast ke Tirkiye goreyê normanê Ewropa bixeftiyo.

Parlementerê Partiya Komunist a Ukrayna Leonid Strizkoy jî kombiyayin de wina vat: "Heveyê kesê birêz Öcalanî zey terorist nîsan danê, feqet wa nay her kes rind bizano ke tarîxa mardimîn bi kesanê ke qandê azadî ûpêdustîn dest çekerdo tifingan ûçekana pir o. Ewropa jî na ray ra ravîrda, nika jî Öcalano na ray ra ravîreno."

Parlementerê Yewnanij Efstratos Korakasî jî sarê kurd û Kosava ardî pêver ûvât ke, nê her di sarê qandê xo îmha ra xelisnayin xover danê. Korakasî qiseyê xo wina dewam kerdi: "Ma biwazim jî mewazim jî Öcalan serokê partiya ke vêsiyê sarê kurdan temsîl keno yo. Partiya Öcalanî vera vardayinan, zilm ûzordayinanê dewleta Tirk dest esto tifingan. Öcalan

m e c b û r  
n ê b i y a y ê  
dest nêçek-  
erdê tifin-  
gan û  
ç e k a n .  
Goreyê min  
Ö calano  
a s t i  
w a z e n o ,  
keso ke astî  
m e w a z o  
hîrê finî  
( r a y )  
a d i r b i r-  
nayin ilan  
nêkerdê".

RALÎ RA XEBER ESTA

# calan: Dewleta ewroyin rê kes xizmet nêkeno

**MEMED DREWS**  
(e.mail:mehmet@welat.com)

ad mabendayin, Doza Sesere 23'ê meng de Girawê Îmralî de fina vînyê. Serokê Gistî yê Abdullah Öcalanî verniyê mehde wesanê Medya ya Tirk rexne vat ke, Medyaya Tirk mahnaya anê ey vurnena ûcoka verê sarî hetê zewbî ca. Öcalanî wast ke ya ya Tirk mahnaya vatenanê ci û sovenîzm ûdismenîna bîrasaran rê xizmet mekiro. Öcalanî ê xo wina dewam kerd: "Medya nê xo yê ewroyina sovenîzm ûbi-saran rê xizmet kena".

Oreyê vatena abukatanê Serokê yê PKK Abdullah Öcalanî ra Ni-Bulganî Öcalanî verê parastina e-le vatenê eyê ke zey "qandê xizci dest ra çiçî bêro oyo bikiro ûxo kay bikiro" Medya Tirk vurûska biyê sebebê çewt fahmker-Öolanî nê çewtkerdinî wina kerdî swînê min vat ez dewleta de-re-xizmetî rô hedre ya. Dewleyin rê ne ez ûne jî zewbî xizmet nêkeno. Ma ancax demokratik rê, dewleta ke lan bido, estîna ïnan qabul bi-zmet kemi. Qe sebebek çiniyo dewleta ewroyin rê xizmet bi-çend finî ard ziwan wa dew-

let haqanê kurdan bisilasno ûbido ci, ma kurdî jî dewlet rê xizmet bikim û Tirkiye rewsê ewroyin ra bixelsinim. Dewleta Tirkiye ya demokratik bikim dewleta gird.

Kista bîn ra Serokê Gistî yê PKK Abdullah Öcalan parastina xo ya esasî de ze ke verî jî vajîya hetê siyasi ser ro vindart. Öcalanî doza sesere qandê dewlet fîrsendo gird hesibna ûvat ke serdarê dewletê komloyê girdî nêvînenê.

Öcalan vat ke, saksê ey de kurdan û-dewleta tirk rê komployo gird viraziyya-yo. Lazim o ke serdarê dewlet nê komloy bivînê ûgoreyê nê komploy tedbîr bigirê. Eke serdarê dewlet ke tedbîr megrî ûpolîtikayanê xo yê verînan de israr bikirê, çiyo ke ame dewleta Iraq ûYugoslavya ser, oyo bêro dewleta tirk jî ser re.

Öcalanî qiseyê xo wina dewam kerdi: "Bewnê hetanî nika qe jûdewlet nîsa PKK goreyê wastena xo bixeftino, xora eke bisayê goreyê wastena xo PKK yan jî min bixeftinayê, ez nika tiya de nêbiyê. Ewro hema hema her dewleta wazena kurdan zey wastena xo bixeftino. Coka her dewleta kurdanê xo resnena. Îsraîl ra bigirê hetanî Amerîka. Dewleta ke ewro kurdê ci çiniyê nîmenda.

Kistê ra Îran, kistê ra Rusya, kistê ra Îsraîl, kistê ra Suriye, kistê ra Amerîka ûkista bînra jî Ewropa. Yanê çim-

her kesiyê kurdan ser ro. Her keso wazeno kurdan banco xo het û Miyanê Rojhîlatî de bibo wayirê vaten. Bewnê hendayê çimê dewletanê kurdan ser ro, iyê wazanê bancê kista xo ûgoreyê wastena xo bixeftinê. Ezo tiya ra vana bêrê ma peynîya nê wastenan biyame, dewlet demokratik bikim. Wa nay her kes rind bizano kurd ûtîrî ke bêrê pê hetek ûquwetê xo jew bikirê, Tirkiye her hetan ra werzena pay ûpolîtikayanê Cihanî de bena wayirê vatenan."

Öcalanî rewsê aboriyê Tirkiye jî rafina çiman ver ûida zanayin ke raya rewsê aboriyê ewroyin ra xelsiyayin jî meseleya kurd a. Serokê PKK, da musnayin ke, eke meseleya kurd raya demokratik üsiyasiya çareser bibo ûpereyê ke ewro serî rê sinê ageyrê bazarê zerî, rewsê aboriyê Tirkiye zey ewro nêbeno. Bado jî ey vat: "Lazim o ke na doz hem hetê aboriya, hem hetê siyasiya zey fîrsendo gird bihesibyo ûgoreyê wasten bixeftiyo."

Öcalanî va ke dewlet zey asîretan meseleya kurd mekiro meseleya heyfîgirotin. Dewletan de heyfîgirotin nêbeno. Dewletî lazim o ke tim ûtim goreyê qezancanê xo yê mest bixeftiyê.

Öcalanî peynîya parastina xo de da musnayin ke, eke mehkema Îmralî de cezayê idamî jî bido ci, dîrok ûwîjdanê sarano ey berat bikiro. Wexto ke ma no niwis kerdê hedre Doza Sesere parastina abukatana hewna dewam kerde.

**K**Endamê Konseye Serokatiya PKK'ê Cemil Bay

# Komployê bi Peymana Washingtonê dest pê

Hûn rewşa Doza Sedsalê çawa dinirxînin. Ji bo iro şûn de hûnê ci bibêjin?

→ Iro li Îmraliyê dozeke dîrokî pêk tê. Ev doz çiqas ji bo PKK'ê û gelê kurd pêwîst be; ji bo gelên Tirkîyeyê û gelên herêmê jî girîng e. Bêgûman encamên dozêne mezin jî mezin in. Te divê bila ber bi çareseriye ve here, an jî bila ber bi idamê ve here dê encamên dozê derkevin holê. Heger mirovan baş bala xwe dabê, Serok Apo li gorî pêwîstî û hêjbûna dozê axaftin kirin. Hema bêje bang li herkes û her derdorê kir. Bi vê yekê guftûgoyek jî da destpêkirin. Ji ber vê yekê her kesî li gorî xwe derbarê çareseriya Doza Sedsalê de dest bi nîqaşan kir. Di besa yekem a dadgehê de Serok Apo geleki serkefti bû.

Hûn dibêjin Amerîka yek ji hêzên çareseriye ye. Li gorî we hedefa Amerîkayê ci ye?

→ Rewşa Amerîkayê hinekî cuda ye. Her çiqas ew xwediyê vê komployê be jî, ji serî heta binî di nav vê komployê de hebe jî, çareseriyeke Amerîkayê heye. Li gorî bingeha berjewendiyen wê di nav Pergala Cîhanê ya Nû de çareseriyeke wê heye. Dibe ku ev çareserî ne li gorî dilê me be, lê çareserî ye. Çareseriyeke Tirkîyeyê û Ewrûpayê tune ye. Ew di bêçareseriye de israr dikan. Kesênu ku çareseriye bixwazin divê wisa tev negerin. Ji ber vê yekê jî heger sibê bêçareseriye derkeve holê, berpirsêne vê yekê kesênu ji bo bêçareseriye israr dikan bi xwe ne. Em dixwazin çareseriyeke teqez derkeve holê. Heger îstîkrar bê xwestin, divê bê zanîn ku îstîkrar girêdayî rewşa Kurdistanê ye. Iro sedema aloziya li Rojhilata Navîn, sedema neçareseriya pirsgirêka li Kurdistanê ye. Diyar e ku kesênu bêçareseriye ji xwe re bingeh digirin, dixwazin kana jiyanê bîçikinîn.

*İnsiyatîfa Dayîkêni Aştiyê ku bi malbatêni leşker û gerîlayan pêk tê pêş dikeve. Hûn vê yekê çawa şîrove dikin?*

→ Ev bihevrebûn bi rastî jî watedar e. Li hemberî vê yekê em rîzdar in û gelek rûmet didinê. Hem dayikêni gerîla hem jî dayikêni leşker û şehîdan divê bihevrebûna heyî xurtir bikin. Heger ji vê eniyê bersiv ji bo Serok Apo bê dayîn, teqez wê çareseriya vê yekê derkeve holê. Heger nexwazin hinekî din janê bikişînin, nexwazin dilê dayikêni din jan bide, pêwîst e gavêne pêşvetir bixwazin. Divê serî li her derî bidin. Divê bi hev re serî



li serokomariye, hikûmetê, parlementoyê, rîexistinê sivil, partî û hêzên navneteweyî bidin. Heta ne bi tenê li Tirkîyeyê, bila zorê li me jî bikin. Bila bixwazin ku di zûtîrîn katê de ev şer bisekine. Em dê gavan bavêjin. Em dê daxwazîn dayîkan pêk bînîn. Jixwe Serok Apo ev yek bi awayekî zelal anî zimê. Di warê ji holê rakirina êşan de em piştigiriya xwe bo her gava ku Serokê me diavêje ilan dikan. Bi hevrebûna her du gelan ku Serok Apo rave dike ev dayîk dîkarin pêk bînîn. Divê her kes rûmetê bi de vê yekê.

*Di hevpeyvînen me yênu ku me bi endamên Konseye Serokatiya PKK'ê re kiribûn de dihat gotin ku gelek kes tevli nav refen ARGK'ê dîbin. Asta beşdarîye iro ci ye? Rewşa vê gavê ya ARGK'ê hûn dikarin bînîn zimê?*

→ Beşdarbûna nav refan bi awayekî gur didome. Di vê yekê de bêguman bandora komploya ku li dijî Serokatiye pêk hat xwe baş dide der. Di tevâhiya kesênu ku beşdar dîbin de ev nêziktêdayîna hevpar derdikeve holê; berê zêde têkiliyên wan bi me re tuneye, heta ne derdorê dost in jî. Berê jî û iro jî ji derdorê ku têkiliyên me bi wan re hebûn beşdarî pêk dihat. Lê beşdarî iro, ji kesênu ku têkiliyên wan bi me re tune ye pêk tê. Ev pêşveçûneke gelekî girîng e. Ev pêşveçûneke gelekî girîng e.

Ev

Beşdarbûna nav refan bi awayekî gur me. Di vê yekê de rola girtina Serokatiye gelekî berbiçav e. Berê jî û iro jî, ji derdorê ku têkiliyên me bi wan re hebûn, beşdarî dihat. Lê beşdarî iro, ji kesênu ku têkiliyên wan bi me re tune ye, pêk tê. Ev pêşveçûneke kî girîng e.

komploya navneteweyî ku pê hat, di her mirovê kurd de bûye sedema raperîna hestêne neteweyî. Heqaretên li dijî Serokatiya Neteweyî qebûl nekiriye. Ev însan wiha dibêjin: "Me berê PKK bihîstibû lê bas nas nekribû. Lê çi çaxa ku Serokatiya Neteweyî, di warê navneteweyî de bi komployê rû bi rû ma; heta çi çaxa ku wêneyên wî yênu ku hatin weşandin me dîtin, em ji binî ve hejîyan. Ji ber vê yekê tevlîbûna nav refan me ji xwe re guncaw dît." Ev hem li nav welêt hem jî li derveyî welêt wisa ye. Hema bêje li her deverê tevlîbûn pêk tê. Ne bi tenê ji kurdan ji gelên din jî tevlîbûna nav refan pêk tê. Ev serokatîne bi tenê Serokatiya Neteweyî ye; her wiha serokatiya her kesênu ku azadiyê dixwaze, pêst û kotekiyê dibîne, ye.

Bêguman bi van tevlîbûnan ARGK ji her alî ve mezin dibe. Dibe ku hin kesênu din hesabêni din kiribin: Heger Serok Apo dîl bê girtin û bê tevger bîmîne dê pêşveçûne nav PKK'ê bisekine, heta wê ji hev belavbûn dest pê bike. Di nirxandineke wiha de ne bêmaf bûn jî. Lewre dîroka kurdan bi mînakên wiha dagirtî ye. Bi tasfiyekirina her serokatiye, tevgera gel hatiye tasfiyekirin. Dîsa dema serokatiye bang li raya giştî dikir, digot: "Vê têkoşînê bi giranî ez dimeşinim." Diyar e ku hinek ders vê gotinê derxistîne. Lewre wan digot ger serokati bê girtin ev tevger wê belav bibe. Ez bawer im wan zû dît ku ev yek pêk nayê. Heta wan ev yek itîraf jî kir û lewma wan wiha got: "Me tişten din hêvî dikirin, lê pêk nehatin." Bi dîlgirtina serokatiye PKK tu car ji hev bela nabe.

*Birêz Bayîk, di pêvajoya iro de hêviyên we ji Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ci ne. KNK dê rola xwe bîlize gelo?*

→ Derketina KNK'ê nû ye. I me de cara yekemîn e ku yekî vî rengî derdikeve holê. Gele e. Lî xwe hê baş nexistiye na. Nû ye, bêtecrûbe ye. Lî, li mî zehmetî û astegîyan re rû bi rû man divê KNK doza li Îmralîjeva xwe. Mijara tekane ya divê ew be. Divê piştigiriya pêşniyazên çareseriye ku Serîlev kiriye, diyar bikin. Divê vî gîhînîn raya giştî ya navnet çareseriya pirsgirêkê de ev KNK pêwîst e di vê çerçovet giştî ya navneteweyî bixe nav-

*Derbarê hevdîtinên PDK DYÂ ku li Washingtonê pêk hûn dikarin ci bibêjin?*

→ Ev civîn ji hêla Amerîkayê organîzîkirin. Amerîka dixvî qubatiya nav kurdan û bêz herêmê ji holê rake û pergale herêmê bide rûniştandin. Bi re eleqedar dibû, hema bêje Kosovayê çareser bû. Ji ber vî la xwe daye Rojhilata Navîn. De dixwaze li Iraqê çareseriye. Dema bixwaze pirsgirêka li ser bike, pêwîst e ku pirsgirêkê çareser bike. Di qada kurdan girêkîn bingehîn hene. Bêyî girêka Iraqê çareser bike, Amerîre li herêmê pergala ku dixwaze niştandin. Lewre jî piştî çare Kosovayê Bill Clinton bangî E cevit kir. Hem vexwendina i hem jî vexwendina PDK'ê û Yî rasthatinek e. Lewre di çareseriya girêka li Iraqê de vî hêz berbiçav

Heman rewşa me ji eleqedar Balkêş e piştî Peymana Washingtonî di 17'ê rezbera 1998'an de pêk hî wan berê xwe dabû Serok Apo. E encama wê peymanê ye.

**HEVPEYVİN: SAVAŞ P**

Têbîni: Ev hevpeyvîn, ji Rojnameya Özîlikîyê hate wergirtin û li kurdî hate werg-